


# WELAT

E

v hijdeh sal in ku  
ez li Ewrûpayê di-  
jîm; tesîra muzîka ewrûpî, te-  
sîra kultura ewrûpî li min bû-  
ye. Lê di dilê xwe de, di hina-  
vê xwe de, di hîsê xwe de, ez  
li ser muzîka kurdî ya folklo-  
rî mezin bûm. Yanê tu, pêşî  
tesîra muzîka kurdî di muzî-  
ka min de dibînî. Lê tesîra  
muzîka ewrûpî û ya amerîkî  
jî baş diyar e.

Kaseta "Mirina Egîdek" wê  
havînê derkeve. Kaseta min  
a ku piştî heyveke dinê wê  
derkeve, bi navê "Bilûra  
min" e. Ji şîira Mîr Celadet  
hatîye çêkirin.

Di kasetê de neh stranên  
gelêrî û yên modern hene.  
Min pênc heyvan li studyoyê  
li ser vê kasetê xebat kir.



Pêşengê muzîka azmûnerî ya kurdî: Ciwan Haco:

## Guherîn pêwîst bû

Rûpel 8-9

**"Rûpoşa Tirkîyeyê dikeve"**, ZANA FARQÎNÎ helwestên dewletên ewrûpî yên li hemberî  
Tirkîyeyê, yên der barê narkotikê de dinirxîne Rûpel 3

Lêkolîna FAYSAL DAĞLI "Welatparêzê bêtirs Remzî û Operasyona Mamût" bi vê hejmare  
dawî lê tê Rûpel 4-5

Ji pênuşa SALIHÊ KEVIRBİRÎ "Ji mexdûrên şer: Zarok" Rûpel 16



Xwînxal: Li ser Cûdî efnsaneyê nû têr afirandin

6



Memed Drews: Ziwan tenya hacet niyo

7



Samî Berbang: Hejmara nû ya Lekolinê

13

## Jî Xwendevanen

EV bû pêncî hejmar rojnameya Azadiya Welat derdikeve.

Ez nizanim wext çawa derbas bûye û bûye pêncî hejmar. Gava çavên min bi hejmara pênciyen ketin, ez di cih de sekinim. Ev dem ji bo min pir dirêj bû. Lî belê, ez pê nehesiyabûm ku, çawa derbas bûye.

Erê, serkeftin ev e, bi awayekî serbilind, li hemberî dagirkiran li ser piyan mayîn. Ji ber vê yekê Azadiya Welat bi ser ketiye û serbilind e. Encama pêncî hejmaran serkeftineke veşarî ye û serkeftin bi xwe yê.

BAHATTIN /STENBOL

BI saya rojnameya Azadiya Welat ez û pir insanên me fêri zimanê kurdî bûne. Daxwaza min ji xwendevanen Azadiya Welat ev e ku, bila rojnameyê di mala xwe de jî bidin xwendin.

Yek jî, bila zilamên me iehdeyê li jîn, qız û xwişkên xwe nekin; bila maşen wan bidina wan. Bila nebêjin jinên me ji tiştekî fêm nakin. Li Kurdistanê bi pîranî malbat qîzen xwe naşînîn dibistanê. Ez bi xwe jî yek jî wan im ku neçûme dibistanekê, min ev yek nepejirandîye, min xwe fêri xwendin û nivîsandinê kiriye. Banga min ji bo qız û jinên kurd e. Divê ew vê jiyanê nepejirînin û bi xwe alîkariya xwe bikin.

HÊVÎ NEMIR/TARSUS

# W

## Ji MGK'ê cudaxwaziyeke nû

SAMI TAN

**L**i Turkiyeyê rapor û biryar li peyhev têr, lê di pratikê de gotina dawîn MGK dibêje. MGK'ê roja 27'ê rîbendanê civîna xwe li dar xist, di vê ci-vînê de biryara sansûre derket. Giranya vê biryare li ser MED-TV'ye ye. Rayerârîn tirk ji bo ku rî li ber temaşekirina MED-TV'ye bigirin, karê ku heta niha bêyî qanûn dikirin, dikin qanûn. Li gorî biryara MGK'ê wê firotina antenê peykê bê kontrolkirin, heta li hinek deveran wê bê qedexekirin.

Îcar ewênu ku şev û roj qala cudaxwazan dikin, her hal wê nikaribin herin antenê li Bebeka Stenbolê berhev bîkin; wê herin li bajarê Kurdistanê yên mezin vî karî bîkin. Jîxwe li hin deve-ran ji berê ve ev kar tê kirin. Li gorî agahiyen ku dikevin destê me, li Ede-neyê polisan çete ava kirine. Ew dîçin antenan li taxên kurdan berhev dikin, tîniî difiroşin xelkê. Wisa xuya ye ku hurmete dewleta tirk ne tenê ji demokrasiye re, her wiha ji mafê mülkiyetê re ji tune ye. Yanê li dijî kurdan maşen bi-

gehîn ê kapitalizmê jî didin bin piyan.

Divê bê gotin ku li ser rûyê dinyayê kesî nekariye rî li ber belavbûna agahiyê bigire. Kurd bi ci awayî dibe bila bîbe, wê li televizyona xwe temaşê bikin. Nûçeyeke ku di kovara Noktayê de heftiya çûyî derket vê rastiyê baş dide xuyakirin. Li gorî vê nûçeyê kurd edî bi doza xwe hesiyane, tehmeke taybet ji televizyonâ xwe digirin û bi hesanî jî dev jê bernadin.

Digel vê biryara MGK'ê, nîqaşa ku bi rapora TÜSİAD'ê li ser zimanê kurdî dest pê kir, hê jî didome. Lî helwesta xîrînexwazan li ser vê mijarê jî wekî her carê ye. Camer ji bo ku mafê weşan û perwerdehiya bi zimanê kurdî nedin kurdan, çeli qelsbûna zimanê kurdî dikin. Li gorî hinekan kurdî ne ziman e, yan jî devok e, têrî perwerdehiyê nake, gelek devok û zaravayen wî hene û hwd. Kesênu ku gotinê wiha ji nava xwe têr dikin, gotarê xwe di rojnameyê tîrkan ên herî navdar de didin weşandin.

Ew kesênu ku li ser zimanê kurdî van tesbitan dikin, ji zimanê kurdî bêhay in. Bo nimûne yekî bi navê Pulat Tacar di Yeni Yuzyila roja 30'ê rîbendanê de dibêje: "Li Turkiyeyê peyivîna bi zimanê wekî Kirmancî, Zaza, Goranî, Soranî û devokê wan qedexe nîn e..." Îcar camêr hê nizane ku ew hemû zara-rayen zimanê kurdî ne û kesênu ku bi soranî û goranî dipeyivin di nav sînorê dewleta tirk de nîn in. Bi vê jî namîne ji bo zimanê weşanen kurdî yên ku li Ewrûpayê têr weşandin dibêje: "Zimanê çêkirî."

Ez bawer im, ew gotinê Yaşar Kemal baş bersiva wan didin: "Zimanê kurdî, zimanekî pêşketî yê destan, stran û çîrokan e. Wî ji sedsalâ 12'yan bi vir de di wêjeya nivîskî de helbestvanen mezin ên di asta helbestvanen cihanê de gihadine." Belê van gotinê Yaşar Kemal raporeke ku di 30'ye avrela-1992'yan ji Turgut Özal re hatiye pêşkîş kirin de, cih girtin. Ev rapor di 29'ê rîbendana 1997'an de di rojnameya Akşamê de hate weşandin.

Wekî encam divê em bibêjin ku berpirsê problemen zimanê kurdî yên heyi, dewleta tirk e, li aliyê din kesênu ku van gotaran dînîsin, ne ji bo çare-seriya probleman, lê ji bo domandina qedexeyê dînîsin.

## Kurd û çiya

DILÜCAN SÊR

**E**m gelekî çiyayı ne. Diyaliktika gelên çiyayı bi çiya ve girêdayî ye. "Diyaliktika kurdan jî ev e." (Sero-katî)

Gelê kurd di Rojhilata Navîn de li Mezopotamyê. (dergûşa şaristaniyê) gelekî pir kevnar û kedkar e.

Lê mixabin ev gel heyâ iro bi sed-salan tim di bin destê zîlm û zordaran de maye. Tim ji bo kesênu zordest xebitiye. Jiyana xwe pêşkeshî dewletê koledar û zâlim kiriye. Welatê kurdan tim hatiye dagirkiran û talankiran.

Di dirokê de hin dewlet û gelên din ji hene; ên ku axa wan hate dagirkiran û gelek ji wan iro najîn. (Inka, Maya, Aztek, Sumer û hwd.)

Gelo çima kurd jî mîna wan di rûpelîn dirokê yên tarî de wîndâ nebûn û heta iro xwe gihadine?

Belê pîr sedemên vê hene. Lî yêne hîrî girîng ev her du sedem in:

1) Xwedîbûna şaristani, çandî û zimanekî pir mezin û dewlemed.

2) Li dijî dagiran xwekeşandina ber bi çiya ve.

Me got welatê kurdan tim hatiye dagirkiran, wêrankiran, bûye warê qetlîaman. Ji ber vê yekê kurdêna azadipêwer tim xwe bi çiya ve girê dane.

Lê ji ber ku ev dagir tim domiye kurdan jî edî careke din xwe ji çiyan berne-

dane. Çiya ji xwe re kirine mesken. Ji ber vê sedemê jî edî kurd li pey ci-vakên pêşveçûyî mane û ji şaristaniyê dûr ketine. Ji pêşveçûnan bêxeber mane. Kurdan tovîn jiyanekî nû li çiya avetiye. Li vir li zimanê xwe, li çanda xwe xwedi derketine û ev nîrxên xwe heta iro anîne.

Kurdênu ku li destan, li bajaran mane di bin bandora dewletê din de mane û kurdiyya xwe hêdî hêdî wîndâ kirine. Kurdênu ku xwe kişandine çiyan ji ber ku jiyanekî bipergal ne gengaz e, ji hev veqetî, bi eşîrtî jiyan. Yanê qutbûn ke-te navbera kurdan û ev jî ji bo netewebûn û sazîkirina wîlâtê bûye astenga herî mezin.

Edî ji bo ku kurd bûne parce parce zordestan jî bi hesanî listikên xwe kirine û kurd xapandise, xayîntî kirine navbera kurdan. Xayîntî ji nav kurdan nema derdikeve heya iro jî. Kurdan gelek caran serî hildane li dijî zaliman, lê her car ji ber ku ji hev cuda ne dîsa hatine qetlîkirin, ên mayî jî dîsa riya çiya li ba xwe dîtine. Mirovîk jî ji bo vê gotiye: "Xayîntiya kurdan li kurdan heye, lê xayîntiya çiyan li kurdan tune ye."

Di serhildana Agiriyê de dewleta tirk gelek kurd kuştin, paşê jî li çiyayı Agirî li ser zinaran wiha nivîsandine:

"Muhayyel Kurdishan burda mefundur." Yanê Kurdistanâ xeyâli li vir razayî ye.

Li gorî wan, kurd ketine xeweke giran û edî tu car nikarin serê xwe rakin. Lî van hesabênu wan heta 1984'an dom kir. Kurdêna "razayî" bersiv dîsa ji çiyan dan, lê vê carê bi awayekî din.

Bi partî, bi artêş, bi enî, bi rîexistinê şoreşerî bersiv dan. Edî çiya ji bo wan dibûn goristan. Edî welatê di nav tariyê de rûyê rojê dît. Roj jî ji piş çiyan derket.

Meleyekî kurd jî wiha gotiye:

"Xwedê dema ku kurd anîn dinê ji bo ku zanibû wê ci bê serê wan, bi wan re çiya jî afirandine."

Servanên kurd xwe ji Cûdî, Gabar, Zaxros, Agirî... berdane ser dijmin û jiyan lê kirine dojeh. Edî navên çiyanan bi navê lehengen Kurdistanê têr ziman.

Belê tê xuyakirin ku rola çiyanan di jiyana kurdan de pir girîng e. Belkî jî em dikarin bêjin çiya sedema hebûna kurdan a heta iro ye.



**ŞAXA** Komeleya Mafen Mirovan (IHD) ya Stenbolê, di 26'ê rôban-dana 1997'an de li Tarık Zafer Tunaya Kültür Merkezi komocivina xwe gişî ya ne-asayı pêk anî. Di 27'ê rôbendanê de jî, ji allî lij-neya rêveberiyê ve Parêzer Ercan Kanar wekî Serokê Şaxa Stenbolê ya IHD'ê hate hilbijartîn. Ji bo sekreteriya şaxê, parêzer Beyhan Yılmaz û ji bo Jimêrkarîye jî Erol Ercan hatin wezifedarkirin. Li gorî hilbijartîna nû lij-neya rêveberiyê ji van kesan pêk tê:

Perêzer Ercan Kanar, Parêzer Beyhan Yılmaz, Erol Ercan, R.Şen Kaya, Leyla Kaya, İsmail Sarıoğlu. Ji bo lij-neya kontrolê, Mu-teber Yıldırım, Turanîl û Alev Çevik hatin hilbijartîn.



**QATILÎN** Bêrivan û Dîlanê beraat kîrin. Weki tê zanîn, di 8'ê gel-wêja 1996'an de li navçeya Küçük Dikiliya Edeneyê, di êrişike polîs û tîman de digel du zarakan 4 kes hatibûn kuştin, kesek jî bîrîndar bûbû. Di bûyerê de polîsek jî hatibû kuştin.

Dadgeha Cezayîn Giran a Duyemîn a Edeneyê, bêy guhdarkirîna dozdar Yeter Kaplan (Bayram) û parêzerê wê, 23 polîsên ber-sûc bêşûc ilan kîrin. Dozgerê Komarê, kîrinên polîsên wekî "nefsî mudafaa" nişan da. Weki tê zanîn, bi raporê Adli Tipê, IHD, Maz-lum-Der û TOHAV'ê diyar bûbû ku bûyer, "înfazeke eşkere û bê-mehkeme ye."

## NÜÇE

# Rûpoşa Tîrkîyeyê dikeve

**Tîrkiye her diçe ji Rojava tecrîf dibe, rûpoşa (maskeya) wê dikeve. Ew ji ber ku jehrê li Ewrûpayê belav dike tê tewanbarkirin, ne ji ber pêkanîna qetîşaman, şewitandina gundan, binpêkirina mafen mirovan û şerê kirêt.**

**S**ala nû, ji bo Tîrkiye bi awayekî baş dest pê nekir. Gerçî di mehîn davî yên sala 1996'an de şanîn vê yekê xwe didan der. Nîmûne: Bir-yarê Parlementoya Ewrûpayê, dozêن ku li diji Tîrkiye yê di Dadgeha Mafen Mirovan a Ewrûpayê de bi encam dibûn, Kampan-yaya Rêxistina Eftiyê ya Navneteweyî ya li hemberî Tîrkiye yê, di warê diplomasî û si-yasetê de xebat û çalakiyên kurdan, perga-la kemali ya çewsinê tengazer dikirin.

Tîrkiye, di destpêka sala nû de di qada navneteweyî de bi tiştekî din re rû bi rû ma. Heta niha ew bêhtir ji ber binpêkirina mafen mirovan dihate rexnekerin. Îcar tiştekî din, "bi hîmayekirina bazîrganên narkotîkê" tê tawanbarkirin, yanê súcdarkirin.

### Wezîfe ya bankayên tîr

Pêşî Holandayên şaxê (şube) bankayên tîr ên li welatê xwe dan girtin, bi hinceta ku ew banka pereyên ku ji bazîrganiya es-rat û eroyînê têni bi dest dixin, transferî Tîrkiye yê dikin. Li gorî raporê dewletên ew-rûpi, şaxê bankayên tîr ên li Ewrûpayê tev bi vê yekê radibin. Her wiha bankayên li bakurê Kibrîs jî, eyñi tişti dikin. Ji ber ku ev beşa di bindestê Tîrkiye yê de bi awayekî resmî nayê qebûlkirin, têkili bi wan nayê kîrin û hesab û defterên wan bankayan li derveyî kontrolê dimînin.

Pişî girtina bankayan îcar hate gotin ku Tîrkiye karê narkotikê dike. Rayedar û des-hilatdarên dewletê Ewrûpayê bi awayekî eşkere daxuyandin ku Tîrkiye bazîrganên narkotikê hîmaye dike. Cara pêşîn ev yek ji aliyê Dadgerê (hakimê) Dadgeha Eyaleta Frankfurtê Rolf Schwalbe ve hate gotin. Schwalbe navê Tansu Çiller bi lîv kir ku ew bazîrganên narkotikê hîmaye dike.

Daxuyaniya Schwalbe, têkiliyên Tîrkiye û Almanyayê anî ber qûtûnû. Tîrkiye yê çar nota hinartin Almanyayê, da ku ji Tîrkiye yê û Tansu Çiller lêborînê bixwaze. Lê Almanya, tenê bi bîra Tîrkiye xist ku dadgerî li welatê wan serbixwe ye.

Di pey vê rûdanê de, daxuyaniyên dewletên mîna Fransa, İngiltere, Amerika û Hollandayê li dû hev hatin belavkirin. Tev ji di-bêjin ku Tîrkiye karê narkotikê dike.

### Daxuyanîyên dewletan

Li gorî rapora Komisyonâ Lîgerîna Çalakiyên Sûcûn Organîze û Organîzasyonê Biyan ên Sûc li Holandayê, ku saziyeke

Parlementoya Holandayê ye, meqamên resmî yê Tîrkiye yê di nav karen narkotikê de ne. Ligel vê, di raporê de tê gotin ku li Tîrkiye yê súc organîze li gorî Holandayê pîrtir e û derdorê súc organîze, servîsên dewletê û karsaz di nav hev de ne.

Di raporê de tê gotin ku di karê narkotikê de tiliya MHP'ê heye. Rapor eşkere dike ku ji sala 1972'yan ve têkiliya MHP'ê ya bi karê narkotikê re hatiye tespitkirin û rayedarên vê partiyê qazancen ku di salen heftê û heşteyi de ji firotina narkotikê bi dest xistine di çalakiyên siyasi de bi kar anîne. Her wiha di raporê de tê daxuyandin ku têkiliya mafayê di serî de partiyen rast-gir, bi hemû partiyen siyasi te hene.

Cigirê Wezîre Karê Hundîrîn û Berpir-sê Qaçaxiyê yê İngiltereyê Tom Sackville ji diyar kir ku ew der barê Tîrkiye yê xwe-dî gumanen cidi ne. Sackville da zanîn ku li gorî agahîyen yekîneyen ku emniyeta İngiliz dide wan, tiliya dewleta tîr di karê narkotikê de heye. Her wiha eşkere kir ku % 80 narkotika ku tê Ewrûpayê, ji Tîrkiye yê tê.

Fransa jî, li gorî rapora ku bi Navenda Çavdêriya Narkotikê ya Jeopolitikê daye amadekirin, da zanîn ku narkotika li Fransa û Ewrûpayê tê bikaranîn, %70'yê wê ji Tîrkiye yê tê. Ev saziya ku li Parisê ye, ji saziyên wekî Konseye Ewrûpayê, Yekîtiya Ewrûpayê û Neteweyen Yekbûyî re raporan amade dike. Rayedarên vê saziyê diyar dikin ku hejmara imalatxaneyen eroyînê li Tîrkiye yê her diçe zêde dibe.

### Helwesta derengmayî

Dewletê Yekbûyî yê Amerîkayê jî li ser van qewmînan bêdeng nema. Komîteya Karê Derveyî ya Meclisa Nûneran bi Rêxistina Narkotikê ya Amerîkayê (DEA), Rêxistina Saloxiyê ya Navendî (CIA) û rayedarên Wezîriya Karê Derveyî re civîn pêk anîn û bûyer û rûdanen li Tîrkiye yê nîxandin. Bi kurtî Amerîka jî bala xwe da ser Tîrkiye yê û dest bi berhevkirina agahîyan kir.

Tansu Çillerâ ku ji bo "Civîna İstîşareyê ya Şesane" çûbû Romayê disa hate sûdar-kirin ku têkiliya wê bi karê narkotikê re heye. 13 parlementerî itâli û senatorekî bi pişkarî daxuyaniyek dan. Di daxuyaniya xwe de gotin ku têkiliya Tansu Çiller bi narkotikê re heye û ziyyareta wê şermîzar kirin. Her wiha wan rexne li Serokwezîr



Prodi û Wezîre Karê Derveyî Lambert Dini kîrin.

Wezîre Pergala Gelempêrî yê Yew-nistanê Yorgos Romeos ji roja 29'ê rôbendanê daxuyand ku têkiliya Tîrkiye yê ya bi narkotikê re, wê bibe Parlementoya Ewrû-payê. Li aliyê din, Romeos bi bir xist ku dewletê Ewrûpayê gelek dereng bi rewşa Tîrkiye yê hesiyane.

### Bêewlethya bi Tîrkiye

Rayedarên dewletê Ewrûpi bi Tîrkiye yê ewle nabin. İterpol dadixuyîne ku Muduriya Gişî ya Emniyetê ya Tîrkiye yê agahîyen şas û raporên newî dide wan. Her wiha rayedarên emniyete yêne ewrûpi, didin zanîn ku agahîyen veşarı yêne ku ew didine karbîdesten emniyeta tîr, dikevin destê ba-zîrganên narkotikê.

Qewimîn û daxuyaniyên pişî Qezaya Susurlukê, gumanâ wan xurtir dike. Çimki derdikeve rastê ku bazîrganên narkotikê bi paseporten kesk digerin û mälén xwe didine firotin. Ev yek ji bi navê "bûyerâ munferît" nikare bê binavkirin.

Ji lew re kesen ku bi madeyên narkotikê têne girtin, gişî ji derdorê iktidara siyasi ne, di nav wan de polîs, leşker, tîmân taybet hene. Di 28'ê rôbendanê li Geverê (Yüksekovala) girtina 84 kilo eroyîn vê baweriye teyîd dikin. Derkete meydânê ku eroyîn a zavayê Mebûsê DYP'ê yê Culemergê Mustefa Zeydan û Serokê Belediya Nehyeya Geverê Byükçiftlikê Hasan Taşev e. Her wiha tê idiakirin ku di sala 1995'an de jî 88 kilo eroyîna kurê Mustefa Zeydan Necmi Zeydan hatiye girtin, lê bi bertîla 120 hezar

markî bûyer hatiye bincikirin.

### Kana şer

Rayedarên dewleta tîr bi xwe eşkere dikin ku salê 8-10 milyar dolar di şerî bi PKK'ê re xerc û zêha dikin. Dewletek çiqas xwediye aboriyeke xurt be jî zêde nikare pereyekî ew qas mezîn bi salan di şer de xerc bike. Her wiha aboriya tîr jî li gorî istatistik ew çend ne baş e.

Hüseyin Baybaşın di hevpeyîneke xwe ya di MED-TV'ye de gote ku wî li ser tek-lîfa Şûkrû Balci (ku wê çaxê Balci Mudurê Emniyeta Stenbolê bûye), dest avetiye karê narkotikê. Mebesta Balci ji ev bûye: Zengîkirina maliyea Tîrkiye yê.

Mine G. roja 29'ê rôbendanê di quncikê xwe yê di rojnameya Radikalê de tiştinan balkêş ji devê rayedarekî Navenda Çavdêriya Narkotikê ya Jeopolitikê dan. Rayedar jê re gotiye ku meaşê ku Tîrkiye dide cer-devanan hemû ji pereyê firotina narkotikê tê. Her wiha rayedar daye zanîn ku gava ew li ser sinorê Tîrkiye yê yê germ digere natirse, lê gava ew li Entebê li navendên en-dustriyê yê teknikê digere zehf ditirse.

Pê namîne û navek jî didê, ku ew kes ba-zîrganiya narkotikê bi Kafkasyayê re dike. Mine G. dibêje ku çaxê wî navî dibihiye, diheyire. Rayedar kû navî wî nehatiye di-yarkirin, ji rojnamevan Mine G.'ye re gotiye eger Tîrkiye paseporten kesk bide qatilan û wezîreke karên derveyî wan mîna qehremanan ilan bike, cendekîn endamên mafayayê bi alê bê peçandin, meşrifîyeta şerî li "Başûrê Rojhîlat" namîne.

ZANA FARQÎNÎ

# Welatparêzê bêtirs Remzî

## û Operasyona Mamût (3)

**Em vê hejmarê dawî li  
rêzenivîsa lêkolînî ya FAYDAL  
DAĞLI tînin? Dağlı di vê beşê  
de jî der barê Operasyona  
Mamût û serpêhatiya Remzî  
Nafî Reşîd de agahiyê balkêş  
pêşkêş dike.**

**Q**efleya operasyonê, di halê girtinê de wê bibêje ku wan xwestiye herin Îranê, lê bi xelêti ketine wê derê. Îfadaya xwe jî bi wî awayî didin. Lê erek û îngiliz ji wan bawer nakin. Remzî û hevalên xwe pişti kişandina gelek pîrsiyariyan, pêşyîê dişinîn Musûlê, pişt re wan dibin Bexdayê.

Welatparêzê kurd Nûredîn Zaza jî wan rojan ji Sûri tê Iraqê. Û ew li hidût tê girtin. Leşkeren erek ji wî û ji hevalên li ba wî guman dîkin ku ew ajanê alman in û xwe bi paraşûtê avêtibin wir. Wan jî dibin Hepsa Musûlê. Zaza, Remzî ji Bêrûdê nas dike. Li hepsê rastî Remzî tê. Di bîranînen xwe de wê demê wisa tesvir dike:

"Her du piyêne wî bi zincîreke bi qasî metreyekê ve girêdayî bûn. Serê zincîrê ji bi guleyeke gelek giran ve girêdayî bû. Demâ dimeşîya çîngîn ji zincîra wî diçû, guleya serê zincîrê girtibû destê xwe."

### Cezayê İdamê li Remzî tê birîn

Mehkemeya wan di sala 1945'an de diqede. Li Remzî "ji ber ku li li Iraqê ïxanet kiriye" cezayê İdamê tê birîn. Hevalên wî ji ber ku leşker in, der heqê wan de hukim nadin. Lê malbata Remzî bi bertîl û rişwetan cezayê wî di temyîzê de diqelibile bîst sal cezayê hepsê. Birayê Remzî Suad jî ji ber ku alîkariya kekê xwe kiriye, demekê di hepsê de dimîne.

Müller, di hepsê de gelek caran li ser têkçûna operasyonê difikire. Çima balafîrê ew avêtîne cihekî xelet? Diviya di ser Gola Urmîyê re xwe biavêtana çiyayîn herêma Silêmaniyê.

Sebebêne xeletiyê du sal bi şûn de tê fîmkirin. Ser qediyaye, alman teslim bû-

ne. Qefleya Mamût jî birine hepseke Filistînê.

Girtiyên vê derê hemû ajan û alîgirên almanan in. Pirê wan jî alîyê eşîren Kurdistan û Azerbaycana Îranê ve hâtine testîmkirin. Wan xwestibû bi destpêka Operasyona Mamût de li Îranê li dijî îngiliz û Sovyetê serhildanekê li dar bixin.

Li Hepsa Emmausê, zabiteki îngiliz ji Müller re dibêje ku wan du heste berî hâtina wan zanibûne ku Müller û hevalên wî, wê xwe biavêjin herêma Musûlê. Pîlôtê ku ew anîne Kurdistanê, ajanê îngilizan e. Dîsa li Berlinê jî hînek malûmaten li ser vê operasyonê stendine.

### Li sehneyê Mele Mistefa

Kurdistan her çiqas bêdeng be jî, plan û fîkrîn rîzgariyê neqediyan. Hîwa xebatên xwe didomîne. Lî dem li dijî kurdan diherike. Tu niyetên îngiliz û ereban ên baş ji bo kurdan tune ne. Li rojhîlatê Kurdistanê Artêşa Sor a Sovyetê bi hînek kurdan re têkiliyan datîne û li wir di bin serokatiya Rêxistina Komela Jîyanewaye Kurd, yanê JQ'ê, de haziriya komareke serbixwe dîkin. Pişti sê salên din wê encamên xebata wan bi şeklê Komara Kurdistanê ya Mehabadê derkeve holê.

Belê pişti Operasyona Mamût çend roj bi şûn de, Mele Mistefa Barzanî bi alîkariya Hîwa, ji sîrgûniya xwe ya Silêmaniyê direve. Ew û mallbata wî ji sîrgûniya Basrayê salekê berê hatin vê derê.

Roj 12 tîrmeh, sal 1943 ye. Hîwa û Mele Mistefa haziriya serhildanekê dîkin. Gelo ev tesadûf e, an na, em nîzanin.

Mele Mistefa bi organizasyona Şêx Letîf, ku ew kurê Şêx Mehmûd Berzencî ye û endamê Hîwayê ye, direve û di ser Iran re diçe herêma Berzan. Şêx Letîf, di sala 1935'an de jî Müller li Kurdistanê gerandiye. Letîf, pişti kû alîkariya Mele Mistefa dike, li Îranê dimîne û li wir bi navê "Nîştiman" kovarekê derdixe.

Pişti ku Mele Mistefa diçe Barzan, çend caran êrîsi ser qerergehêne iraqiyen dike û gelekan dipelişine, pişt re dixwaze bi îngilizan re dest bi hevdîtinan bike. Îngiliz û rejîma Serokwezirê Bexdayê Nûrî

med, Remzî yek ji serokê tevgera Kurdistanê ye û heqê her kesî heye ku ji bo azadiya welatê xwe bi şeytan re jî hevkariyê bike.

Nivîskarê sosyalist Muhemed Mele Kerîm di rojnameya Hevkarî de bersivê dide Muhamed. Li gorî Kerîm, niyet û armançen Remzî baş in, lê wî alîkariya nazîyan kiriye û ev xelet e. Kerîm dibêje: "Nazîyan bi Sovyetê re peyman çêkiribû û pişti peymanê careke din êrîsi wan kîrin. Ji ber vê yekê mirov bi wan nikare bawer bike."

Mamosta Îzefin Feyzî Kerîm rexne dike û dibêje Kerîm dixeyide ji ber ku

Saîd, hevdîtinan dimeşînin. Hîwa di vê pêvajoyê de rola navendiyê digire ser xwe. Û gelek xurt dibe, li hemû Iraqê şaxan vedike. Lê pişti demeke din gelek endamên wê daxîlî refen Mele Mistefa dibin û tevî wi diçin Mehabadê, gelek jî tê girtin. Hîwa hêdi hêdi ji dika dîrokê vedikise û cihê xwe dide rêxistinê Rizgarî, Şoreş, Azadî û paşê jî PDK'ê

Remzî û hevalên wî, vê serhildanê di hepsê de dibihîzin. Müller, "Em li derive bûna meyê ev serhildan destek bikira" dijêje.

Remzî, Müller û almanen din pişti serhildana Barzanî ji Bexdayê dişinîn Qahîreyê. Li vê derê li wan îşkenceyên xedâr tê kîrin. Ev der qeregeha îngilizan a gelek bi nav "Ma'adi" ye. Remzî û her du almanen din ji ber van îşkenceyan aqil diavêjin. Müller kare li ber xwe bide. Ji wî re dibêjin: "Heta tiştên ku em ji te dixwazin hîn bibin, emê te sax bihêlin û metodîn îşkenceyên cur bi cur bi kar bînin." Paşê wan disa dişinîn Bexdayê. Müller li vir pişti salekê Remzî û hevalên xwe yên din dikare bibîne. Pişti serpêhatiyê vê derê disa wan dişinîn Bexdayê, ji vir disa berê wan didin Filistînê û careke din Qahîre.

Cara paşîn Remzî ji wan diqetînîn tînin Bexdayê. Ew êdî hev nabînin. Müller li Qahîreyê du caran ji hepsê direve, lê her du caran jî tê girtin.

Remzî pişti ku ji ber îşkenceyan hisê xwe diavêje, dewleta erek wî di dawîya rojîn sala 1945'an de berdide.

Ji sedemên ku êdî azad e, li gundê Terçanê şahî tê lidarxistin. Nav û dengê Remzî û îşkenceyên ku ji bo fîkra azadiya Kurdistanê lê hatine kîrin, li hemû deve-rê Kurdistanê hatîye bihîstin. Bi hezaran insan tê ziyareta wî. Der heqê wî de gelek çîrok û efsane hatine çêkirin.

Lê tenduristiya wî xera bûye. Tu derman jê re feyde nakin. Di meha rezbera 1947'an de jî li Hewlîrê, ji jiyanê re çavên xwe digire.

Müller û hevalên wî jî, di sala 1947'an de tê berdan. Müller li Almanyayê jî demeke kin girtî dimîne.

### Rêxistina Hîwa

Pişti têkçûna serhildana Barzan a sala 1933'yan, Kurdistan di nav bêdengiyê de bû. Dagirkirîya ingiliz û xulamên wan rejîma Bexdayê gelek xedâr bû. Hêz û serokê welatparêz hemû an reviyan an jî li sirgunê bûn. Di van şertan de ji welatparêz kurd dixwestin careke din dest bi meşê bikin.

Di salen 1937-38'an de xorten hevalên Remzî yên Lîseya Kerkukê, rêxistinê bi navê "Derkar" ava kîrin. Wan ji rêxistina Carbonarî ya italyanî feyz girtibûn. Carbonarî li dijî faşîstên Musolinî dixebeitî.

Di nav sazûmankarêne Derkar de, nivîskarê marş'a 'Ey Rakip' Yunis Rauf Dildar, Nurî Şawês û Mukerem Talabanî jî hebûn. Emrê van xortan bi piranî li dora bîstan bû. Ji bo ku ji wan re serokatî bike, ew diçin ba mamooste Refik Hilmî. Wî bi salan ji Şêx Mehmûd re mişawirî kiriye, mamoosta ye û mirovekî naskirî ye. Ji wî rica dîkin ku ew bibe serokê Derkar.

Derkar li ser kaxiz, ji xebatên siyasî dûr dihate xuyan. Armanca wan a fermî xebatên çandî û civakî bû. Lewre dagirkirêne îngiliz û rejîma Bexdayê ji bo xebatên siyasî musade nedîdan. Hilmî teklîf qebûl dike. Lî navê Derkar tê guhartin û bi navê "Hîwa" xebata xwe didominîn.

Hîwa di demeke kin de li hemû Kurdistanê belav dibe, welatparêzân digire bin baskê xwe û dibe rêxistîneke neteweyî.

Hîwa rêxistîneke nîv-legal bû. Lîne partiyekê bû jî. Wek komeleyekê hatibû sazkarin. İdeolojiyeke wan tu ne bû. Ji hemû qadîn neteweya kurd mirov di nava vê komeleyê de cih digirin. Fîkra wan a sereke azadiya Kurdistanê bû. Di nav Hîwa de mele, şêx, axa, xwendevan, zabit, karker, rewşenbir û gundî hebûn. Hîwa li hemû bajarêne girîng ê Kurdistanê û bajarêne wekî Bexda, Basra, Mûsul ji şube vekiribûn. Endamê Hîwa, li Şam, Tahran, Lubnan, Stenbol û çend bajarêne Ewrûpayê jî belav bûbûn.

Di Hîwa de bi esasi du fîkri hebûn. Hînef ji wan alîkariye Yekîtiya Sovyetê, hînef jî alîkariye îngilizan bûn. Lî minakêne wekî Remzî jî gelek hebûn û mirov iro dikare bibêje di Hîwa de refek ji alîgirêne Almanyayê jî hebûn. Lî belê ji ber têkçûna almanan û derketina xerabiyê nazîyan wan zêde xwe eşkere nekir. Zixa û îngiliz û ereban jî gelek hebû û wan her tim nêçira terafdarêne almanan dikir; li Kurdistanê gelek ji wan kuştibûn jî.

## Nîrxandîna çalakiyên Remzî

Pişti giriya Remzî ji bo azadiya Kurdistanê bi almanan re caran di nav hînef rewşenbirê Başûr de bûye sebebî munaqşeyan. Rewşenbirê kurd, tebien çalakiya Remzî li gorî ramanen xwe yên ideolojik nîrxandin.

Lê belê ci di vê bûyerê de û ci di yên din de hatîye dîtin ku itîfaqen di nava hêzîn ne wekî hev de, her dem bi şert in û nagîhî je tu encamê. Ew li başûrê Kurdistanê rastiyeke bi ês e. Nîrxandinê hînef rewşenbiran bi kurtayî wisan in:

Nivîskar Mesûd Muhamed dibêje ku Remzî qehremankî neteweyî ye û şehîdî herî mezîn ê Hewlîrê ye. Li gorî Muhe-

med, Remzî bi rûsan re hevkarî nekiriye. Lî kurdan li Mehabadê bi rûsan re itîfaq kir û bersiva xwe girtin.

Nivîskar Bedran Hebîb, ku pirtûka Müller di sala 1988'an de ji îngilizî vergerandiye kurmanciya jêrê (soranî), li ser Remzî wisa dibêje:

"Pişti Remzî, serokatiya tevgera kurd 50 salen din jî tecrûbe girtiye, lê belê disa jî wekî berê ye. Remzî welatparêzeki mezin e. Ew her çiqas ji burjûvaziya kurd be jî, nîmeten çîna xwe red kiriye û ji bo welatê xwe, di tariya şevê de xwe ji bilindâhiya bi hezaran metreyî avêtîye nav axa welatê xwe."

Belê em li vir parantêzek ê vekin û bipirsin. Operasyona Mamût bi ser bi keta, yanê Remzî bigîsta armanca xwe û Başûr biketa bin kontrola almanan, wê ci bûya? Wê, ev bûya: Naziyan li cihênu ku dagir kirin ci kirin, wê li Kurdistanê jî vî bikirina. Cara pêşin wê cihûyên Rojhilata Navîn qir bikirana. Kurdistan, Iran û Iraq wê di nav artêşen alman, îngiliz û Sovyetê de bipelişîya. Û ev herêm wê ji şerên wehşîtir re bibûya meydan. Û ji ber ku almanan şer winda kir, xeyleke wekî Kurdistana azad a ku bi almana ve girêdayî jî, wê vala derketa.

Ji aliye din ve, di vê pêvajoye de Sovyet û îngilizan jî ji kurdên mazlûm re dostanî nekirine. Serhildanê Başûr bi marifetên hingilizan hatin şikestin û Komara Kurdistanê ya Mehabadê bi alîkariya Sovyetê hat xerakirin û ew qas xwîna kurdan hate rijandin. Kurd bûn qurbanê realpolitikê. Wekî komunistên Ewrûpaya Rojava û hînek gelên din.

Bi kurtayî, serpêhatiya Remzî û Şerê Cihanê yê Duyemîn careke din nîşan da ku neteweperweriyeke bi desteka hêzên biyanî nagîhîje tu encamhe. Lê kurdap ev dîtine anna? Pişti vê serpêhatiyê her çiqas pêncî sal jî derbas bûbe, mirov mixabin nikare bibêje ku ev guftugo li kurdistanê qediyaye.

Ü hêjî li welatê kurdan şeytan cîrdê diaveje.

# Li Kurdistan Bandora Almanan

**I**ngilizan welatê kurdan dagir kiribû. Wan jî ji îngilizan nefret dikir. Îngilizan bi Almanan re şer dikir. Kurdan dixwest ku îngiliz vî şerî winda bikin û ji welatê wan derkevin. Ji ber vê yekê dixwestin alman bi ser bikevin. Gelê Başûr sedemê şerî ideolojik û siyasi nîzanîbû.

Wan ideolojî û mahiyeta sistema naziyan jî nîzanîbûn. Alîkar û ajanê naziyan li Kurdistanê dixebeitin. Ü digotin kurd û alman ji nîjadekê ne û şer û neyarêwan jî yek in. Wan ji kurdan re azadî û dostanî waadikir. Di nav gelên cahil de heyraniyeke almanan û Adolf Hitler hebû. Gelekan

navê zarokên xwe Hitler datanî, simbêlén hînek zilaman wekî yê Hitler bû. Hinekan wekî naziyan silav didan, Yek ji wan ku navê wî Hitler bû futbolvanê takima Hewlîrê bû. Bi kurtayî jê re tê gotin Hitler. Ew gelek navdeyî bû û hê jî dijî. Gelek Hitlerên kurd ji tîrsa îngilizan navê xwe guhartin. Li Hewlîrê niha jî carinan bi henekan çîrokên wê demê tê gotin. Li qezaya Maxmur a Hewlîrê, kahwevanekî sempatîzanê Hitler dema xebêra mirina Hitler dibilize ew ji qirîza dil derbas dike û dimire. Heta salê dawî mirovekî pîr ku aqil avêtibû, hê jî bawer nedikir ku Hitler

mîriye û ku yet jê re bigota Hitler mîriye, bi gopalê xwe êrişî wan dikir.

Di salê şer de mirovek bi navê Eleman Kurdi serketinê artêsa alman a ku ji rad-yoyan dibihist, li kûçen Hewlîrê bi qêrîn û coş digot. Vî mirovî digot ku ew bi Hitler re bi telefonê axiviye û Hitler soz daye wî, ku wê kurdan xelas bike.

Mamosteyê edebiyatê yê Zanîngeha Selahaddin Profesör Dr. Maruf Xeznedar der heqê Eleman kurdi de, di sala 1970'yi de pirtûkek çap kiribû. Xeznedar, bi zimanekî esprîtuell çîrokên Eleman Kurdi ku ji gel re digot, aniye ziman.

## MÜLLE RÜNAZİTİ

**H**evalê Remzi yê operasyonê Mîralay Gottfried Johanes Müller dibêje ew ne nazî ye. Lê wî wekî zabiteki baş, xwestiye ku wezîfa xwe bike. Di pirtûka xwe de ji cihîyan xwes behs dike. Lê nêzîkiya kurd û almanan bi şeklê nêzîkbûna nîjada arî izah dike. Ku ev fikreke naziyan e.

Sedemê ku ketiye vê operasyonê, bi qasî berjewendiyê Almanyayê, hezkirina wî ya li hemberî kurdan bi xwe ye jî, ku xwestiye wan ji dîli-tiyê xelas bike. Ji bo nîvîsan-dina pirtûka xwe jî dibêje, di hizûra xwe de efûkirina wî û Remzî bûye.

Müller, di sala 1945'an de wekî mehkûmekî ji Kurdistan ê vejetiyabû. Lê careke din, di sala 1992'yan de wekî mîvanek çû Kurdistanê. Mesût

Barzanî ew dawet kiribû. Di vê ziyareta xwe de biraziyen Remzî ew birin Hewlîrê. Müller 50 sal bi sün de li wan mekanênu ku qedera wî nîvisandine, geriya. Qesra kutê de razane, cihênu ku xwe tê de veşartine, careke din dît. Bi malbata Remzî re ma, ji wan re behsa wan rojan kir.

Müller pişti şer, di sala 1951'ê de li Almanyayê saziyeke alîkariyê bi navê Salem ava kir.

Di ziyareta xwe ya Kurdistanê ya di sala 1992'yan de xwest kû li wir alîkariya avakirina gundan jî bike. Ji bo vê, li cihênu ku di sala 1943'yan de bi paraşütê xwe avêtibû, dest bi çekirina gundekî kirin. Lê di nîvî xebatê xwe de ji alî ajanê Saddam ve, xebatkarên Salemê hatin gulebarankirin û ji wan du kes giran birîndar bûn. Pişti vê bûyerê Salem ji herêma veki-siya.


Lê belê, der heqê Salemê de idayênu ku ew doza desthilatiya naziyan dike, hene. Di rojnama Süd Deutsche Zeitung de roja 3 resemî 1995'an li ser serpêhatiyen wî,

roportajek hat belavkirin. Roja 8 resemî 1995'an de rojnamevan Markus Gute di rojnameya Junga Welt de, Müller bi naziyyîte tewanbar kir û rojnameya Süd Deutsche rexne kir, got ew ji Müller re bûye hacet.

Li gorî nîvîkarê Junge Welt, saziya Müller, Salem wekî saziya sempatîzanekî naziyyayan bi nav dike. Gutte dibêje, di sala 1971'ê de di kampa xorta a Salemê de Müller, ji bo ruhê şefê Gestapo yê Walter Reder Herbert Kapler ra dua daye xwendin, ku her du jî sîcdarêne şer bûne. Pişti ku ev rewş eşkere dibe, senatoya Berlinê xortan naşîne kampên Salemê. Ev skandal, di sala 1971'ê de di rojnameyên Stern û Zeit de hat belavkirin. Gundênu ku Salem li Rûsyayê ji bo koçerên alman ava dike jî, bi destê Neonazi Manfred tê çekirin. Dema em van tewanbaryan ji Müller dipirissin, ew dibêje: "Dijminen min gelek in." Ü şopa suikasta ku li dijî wî hatiye kirin, nîşanî me dide. Ku bi tivingê gule berî mala wî dane.

## Têkoşîna li hemberî bêdadiyê (3)

CELALETTİN YÖYLER



**D**i vir de dema ku em dibêjin têkoşîna li hemberî bêdadiyê bêcudatî divê bête meşandin, ango olâ İslamiyete bîryar û fermanê wê ji bona hemû kesan in. Lê bi taybetî her tim destgîrtin û piştevîya lêzim û nêzikan bi awayê ola İslâmî di beriya her kesî de ye. Ji bo ku ew lêpirsîna tiştekî taybetî ye, felsefî ye û zanyarî ye. Hem jî egara jiyana gelan e. Bê yî wî jiyan nabe û nameşe. Hem jî pirsa mirovahiyê ye, mantiq û felsefe ye. A ji bona wî ye ku her tim Xweda û Pêxemberê Xweda doza gelnasîn û gelperwîriyete didane pêşîya pirên pîrsigirêkîn mirovahiyê.

Ji bo alîkirina bindest û beblengazan Ehmedê Kurê Henbel wiha riwayet dike û dibêje ku Pêxember (silava Xweda li ser be) di vê mijarê de wiha gotiye: "Xwe biparêzin jî nîfrînê stem lêbûyan, heke ew kafîr jî bin. Ji ber ku li pêşberî wê nîfrînê, perde tune ye." Ola me misilmanan wisa ye. Bêdadiyê û stemkariyê napejirîne. Her tim alîkarê bindest

û belengazan e.

Lê pir mixabin pirên misilmanen vê demê, di çewtî û delalet û şâsiyeke pir mezin de ne. Haya wan ne ji wan heye ne jî ji ola wan. Hem jî ne ji wan tişten ku Xweda û rî ji wan re ferman kiriye bi pêkanîna wan tiştan. Belê pir rast e, çawa ku 'misilmanen û rî' riya xwe şâş kirine wisa jî, bi hiş û ferasetê wan hatiye liştinê. Kî bi hişê wan liştiye? Hinek desten çepelên di bin hînek siyaseten bi gemar de, desten tarîtyen di piş perdeya meleneta xapandina cur bi cur ên kesan û gelan de, ji bona berjewendiyen daxwazên xwe yê pelîdî (seytanî) û gemarî.

Hem wî destê di bin perdeya meleneta siyaseta pelîdî de bi wan liştiye. Hem jî "wan misilmanen bêmêjî" ew di xew rî kirine, bi xewa perşanîyê û tu carê bi siyaseta wan a hundirîn û dervayî nehesin. Çawa ew di xew re kirine, wisa jî xwîna wan mêtine û keda wan xwarîne, hemû heyînên wan ên girîng û birûmet. Anglo ew rût kirine û ji hemû raman û pojinandînên gelêri û serfirâzî û gelperwîren. Hem jî ji wan misilmanen bêmêjî re tu hêzek nehiştine, ji bilî navekî rût wekî "Teyrê Enqa."

Wî destê veşartî çawa bi nirx û heyînen gelan ên, birûmet û pîroz liştiye. Wisa jî tevdanî û dijiminahî xistîye navbera cur bi curêwan gelan û kesan. Heta tevdanî û nakokî xistîye nava binemal û civakan û perestgehêwan. Hem dijiminahî, hem jî bûye sedema

bihevdeketin û qirêñ û xwînîrjandinê. Hem jî wî destê veşartî û mêtîngîriya bi her awayî, daxwazên xwe bi gelên bêmêjî dane qebûlkirina bi riya kerîkirin û jihevdûrxistinê, di suna yekîtiyê û hevgirtinê de. Hem jî dijiminahî û xiyanet di cihê hezkirinê û biratiyê û hevaltiyê de bi wan dane pejrandin. Bi wan dane qebûlkirin sistî û razana li ser textê hay ji xwe nemayînê û nezaniyê û bêhişiyê, di cihê nîrxên wekî bi ser xwe ve hatin, hişyarî, zanyarî û xwenaskirin de.

Hem jî vê siyasete û destê veşartiyê gemarî bi wan dane qebûlkirin, bi xê piçûk dîtinê û bi pintîtiyê û bi koletiyê di cihê serbestiyê û xweşîjiyan de.

Ew misilmanen bêmêjî yê ku bûne bendê dûv hebana mêtîngîriya ola İslamiyete ya paqî; ew bûne wekî kelempêrê ber bayê û ser avê. Ew ne bi serê xwe ne. Mêtîngîriya ola paqî çawa wan bidine meşandin, ew wisa dimeşin. Çawa ku bûne wekî kelempêr, wisa jî ji wan re tu rûmetek nemaye di nava kesen ku di cihânê de birûmet dijîn.

Hem jî dîsa ji wan re rûmetek nemaye di nava jiyanâ nûjen a cihânê de. Wisa jî tu kesek ji civakî û komelên pêşverûyên xwenas berê xwe nadîne wan û ji wan pirsa pîrsigirêkîn wan ên siyasi û civakî nakin.

Nîşê: Ev nîvîs jî pirtûka min a bi navê "Gelempêrî û Nijadperestî" ye.. Di nêzîk de wê bê çapkirin.

# Li ser Cûdî efsane yên nû tên afirandin

Di dîrokê de ji bo me rojek hilatiye. Wextê em li pey tirêjên wê rojê biçin, emê li cîhanê bigihîjin Rojhilata Navîn; ji wir emê herin Kurdistanê, ji Kurdistanê emê herin Botan û ji wê herêmê jî emê herin Çiyayê Cûdî. Cûdî ji bo me sembola jiyanek nû ye.

**C**iayê Cûdî, digel mîtosa Nuh Pêxember tê nasîn. Kesê ku navê Cûdî nebihîstibe, gerek nemabe. Ji bo dostan, qen-can, mafdaran Cûdî heybetek e, ronahîyek e, ji bo neyaran, dagirkeran, bêmaf û dijminan jî wekî hêlinâ teroristan, cihê mirinê û tariyê tê zanîn Cûdî. Lî belê Cûdî ci ye? Li ku derê ye? Emê bi bersiva van siwanan re Cûdî bidin nasîn.

Di dîrokê de ji bo me rojek hilatiye. Wextê em li pey tirêjên wê rojê biçin, emê li cîhanê bigihîjin Rojhilata Navîn; ji wir emê herin Kurdistanê, ji Kurdistanê emê herin Botan û ji wê herêmê jî emê herin Çiyayê Cûdî. Sewq ji çiyayê Cûdî bilind dibe. Cûdî ji bo me sembola jiyanek nû ye.

Li herêma Şehrê Nuh Şîrnexê, di navbera Şehrê Nuh, Cizîra Botan, Girkê Emo, Silopî û Qilaban de cih digire. Cîranê Cûdî; di hêla rojhilate de, çiyayê Gelikurtiya û Sineht, di hêla rojava de Çiyayê Gabar, di hêla başûr de, Deşta Girikê Emo û di hêla bakur de, Çiyayê Fila, Çêlê, Nimîja û di pey wan de jî Bestan û Çiyayê Herekol hene. Van cîranê Cûdî, tevî li hemberî zîlm û zordariya dîrokê ku li ser gelê me hatiye meşandin dest dane hev û gelê me di hembeza xwe de parastine.

Gundêni li Çiyayê Cûdî: Şax, Hevler, Dêra Kema Hesena, Sorbitmê, Girê Cûlya, Xinis, Dêrgê, Bêşêrê, Bêspin, Herbûl, Silip, Cilbiya, Gendana Besta, Bili-ga, Serava Kiça, Mendişana, Divin, Dûvyan, Aşê Alîxan, Bestika Mêrsina, Avgâ Masûya, Şîlerût, Serê Dehlê, Bil-kasma, Cifane, Akut, Gundikê Sipîndarê, Gilîndar, Nêvana, Gundikê Remo, Nêvakara, Benavya û hwd. jî hene. Lî belê iro li herêma Cûdî ji çend gundan pê ve, tu gund nemane. Gişk, an ji ber zîlm û zordariya leşkerên dagirkeran hatine valakirin û gundî koçber bûne, an jî, bi zorê gund hatine xerakirin, şewitan-din û kavil bûne. Çend gund hebin jî, wan sermîşî û îxanet qebûl kirine û bûne sîxur û cerdevan.

Wextê mirov bala xwe dide nal û ni-hîl, taht û zinar û çem û robarêni çiyayê Cûdî, mirov dibêje qey cih û warê şer û pilingan e. Her dehl û rezên Cûdî wekî quncikênu buhiştê ne.

Çemê Nêrdûs, robarêni Hesena, Bes-pîn, Cilbiya û Herbul her yek li hêlekê ye di çiya de diherike, ji Dicle re dibe navzê. Bilindaya Cûdî 2089 metre ye. Kesêni li ser Cûdî jiyanek, tu cara hesreta wî ji bîr nakin. Lî ci bikin iro, li çar ali-yen cîhanê belav bûne û warê xwe teri-

kandine.

## Dîroka Cûdî

Erê ma qey kes napirse, çîma jê re dibêjin Cûdiyê Mirada? Ev mirad ji bo ci ye? Emê bersiva vê jî, ji mîtosa Nuh Pêxember bistînin. Berî tûofan rabe, ji Çiyayê Cûdî re digotin Çiyayê Gotî û ev dirêj dibe heya Gotî, Botî, Batî, Gewdi, Guyî, Botah, Mezra Botan, jî ji vê pey-vê tên. Eşir jiyanek xwe hê jî berdewan dîkin. Wekî Eşîra Guya, Eşîra Bet û Eşîra Gewdan..

Di mîtosê de wiha dibêje: "Wexta tofan radibe keştiya Nuh Pêxember di ser Çiyayê Cûdî re derbas dibe. çiya gişk xwe ji ber keştiya Nuh nizim dîkin ku keşti li ser çiyê nesekine. Gava keştiya Nuh di ser Çiyayê Cûdî re derbas dibe, çiyayê Cûdî xwe ji keştiye re bilind dike ku li ser bisekine. Dema keştiya Nuh xwe li çiyayê Cûdî digire û cihê xwe li ser Cûdî dibîne û tê de ji Çiyayê Cûdî re tê gotin Çiyayê Cih-dî, ew jî dirêj dibe û di dawiyê de jî bûye Çiyayê Cûdî."

Çiyayê Cûdî enternasyonal e. Misilman, xirîstîyan, müsewî, zerdeşti, yêzid û olêni li ser cîhanê gişk kesen eslê wan reş, yên eslê wan spî û yên eslê wan zer gişk Çiyayê Cûdî ji xwe re qiblegeh, pîroz dibînin û baweriya wan gişkan bi wê mîtosê heye. Nêvsîra Cûdî, cihê keştiya Nuh Pêxember lê sekînî bûye cihê serdana heca gelan. Ji vî cihî re dibêjîn sefîne. Ci insanen baweriya xwe bi qiblegeha Cûdî tînin, gel, ol, ziman, reng, esil feriqiyê naxîn nava wan û tev de dicin serdana Cûdî û Cûdî tewaf dîkin.

Her sal meha her sê hefteyen pêşî yên tîrmehê, dema serdana heca Cûdî ye. Çiyayê Cûdî cihê mirad û mexsedê ye, cihê kîf û şahîye ye, dermanê laşê birîndaran û çareya derdîn bêdermanan e. Her ci kesen zarokêni wan ku şehîd bûne, yên zarokêni wa çenabîn, qîz û xor-têni ji hev hez bikin û yên kîf, sihet û eş-qê biwazin gişk di meha tîrmehê de berê xwe didin Çiyayê Cûdî û dicûn serdana Cûdî. Ji yezdanen xwe re lavahî, dû-ayan dikirin, qurban şerjê dikirin, dax-waz û hêviyêni xwe ji Yezdan dixwestin û kîf û seyran dikirin. Derwêş û feqeyan li erbana dixistin û halet (zikir) dikirin.

Qîz û xor-tan tev de dawet û dîlan digirin. Ev her sê hefteyen serdana Cûdî wekî id û cejnê derbas dikirin. Gelek qîz û xor-tan li vê derê dil didan hev û ji hev û din hez dikirin, gelekan ji li wê derê soz didan hev û gustilikêni xwe bi hev û din diguhartin. Gelek jî li vê derê bi hev û din re dizewiciyan û digihiştin mirad û



mexsedên xwe. Ji bo vê yekê jî navê Cûdî bûye "Cûdiyê Mirada" kîjan insan ku heft salan biçuya serdana Cûdî, wekî çûye hecê dihat dîtin.

Dîrok çiqas pêş ve biçe û dirêjtir bi-be, şer û nakokiyêni li ser aboriyê jî bêhtir giran û tûjtir dibin. Di dîrokê de piraniyê van şeran li ser Rojhilata Navîn hatine çêbûn. Li Rojhilata Navîn piraniyê wan li ser axa Kurdistanê navendî bûne. Dewlemendiyê Kurdistanê yên sererd û binerd bala dijiminê kedxwar dîkişine ser xwe. Çiqas şer gurtir bûne, ew qas jî dora Cûdî hatiye talankirin û insanen dicûn serdana Cûdî jê hatine ke-tandin û qutkirin.

Bi derketina İslamiyetê re olêni ji derveyî İslamiyêtê, ji serdana Cûdî hatin qetandin. Misilmana serdan li wan qedexe kirin. Edî ji xeynî misilmanan û gelên nêzîki derdora Cûdî tu kes nedihat serdana Cûdî. Dema di dîrokê de sala 1639'an de Peymana Qasri-Şîrinê çêbû û Kurdistan bû du parce, gelê me yê Rojhilat jî, ji Cûdî hat qetandin. Pişti sala 1923'yan imzekerîna Peymana Lozanê jî ku Kurdistan bû çar parce û komara tîk hat avakirin jî gelê me yê başûrê mezin û başûrê biçük jî, ji Cûdî hatin qetandin. Kesen dicûn serdana Cûdî, hêdi hêdi jê dihatin qutkirin. Ji xeynî eşîren derdorê herêma Cûdî tu kes nemabû ku Cûdî ziyaret bikin.

**Rewşa Cûdî ya iro**

Iro ew jî nemane. Pişti derketina tev-gera azadiyê û hilpişkîna 15'ê Gelawê-jêjî valakirin, xerakirina gundan dest pê kir. Gundêni di hembeza Cûdî de jî yek bi yek hatin valakirin, xerakirin, şewit-tandin, wêrankirin û talankirin. Cûdî ji insanan tê paqîjirin. Dijminen dagirkir tu gund nehiştin ava, ji xeynî çend he-ben ku îxanet qebûl kirin û bûn cerdevan. Çûyîna Cûdî hatiye qedexekirin. Lî belê dijmin bi xwe jî newêre li ser Cûdî bimîne. Tîrsa şervanen azadiyê dil û hinavên wî parce parce kiriye.

Ciqas gundê Cûdî hatine xerakirin û şewitandin jî iro qîz û xor-tan me tevde destê xwe dane hev û dilê wan bûye yek û berê xwe dane miradê xwe. Hezkirina wan wekî deryayê ye, eşq û evîna wan wekî çiya ne, tema çiyayê Cûdî mezn e.

Hêvî û miradê Cûdî nû dîkin. Ser-dana Cûdî ji bin destê dijminan rizgar dîkin û li Cûdî her roj dîkin cejn û id. Çiqas ew li Cûdî xwedî derdikevin û diparêzin, Cûdî jî ew qas li wan xwedî derdikeve û wan diparêze.. Ev 13 salin li ser Cûdî şerê çekdarî tê meşandin lê di vi şerî de tu car gerîla nehatine şikandin, zede zaiyatêni gerîla li wir çenebûne. Tim û tim dijmin li ser Cûdî hatiye şî-kînandin û gelek leşker li ser Cûdî tên kuştin. Şervan li ser Cûdî Mîtoseke nû ava dîkin.

XWÎNDAL



● 3.2.1979

Ayetullah Xumeynî İktidara Şah hilweşand û bi şoreşa İslâmî li Iranê desthilatî bi dest xist.

● 8.2.1925

Di sala 1922'yan de li Erzeromê di bin serokatiya Mîralay Xalid Begê Cibrî de Civaka Azadiya Kurdan ava bû. Kurd di bin sîwana vê civakî de, di demeke kurt de li Bilîs, Mezra (Eleziz), Amed, Ruha, Sêrtê û li gelek deverên din yên Kurdistanê dest bi xebatê rizgariyê dîkin.

Şêx Seîd, zavayê wî Şêx Abdullah, Şêxê Paloyê û Şêx Şerif jî,

beşdarî vê xebatê dibin. Şêx Seîd, ji bo birêxistina gel li Kurdistanê digere, di vê navberê de der hegê Şêx Seîd û çend serokên kurdan de, ji aliyê daggehê (mehkeme) ve bîryara tewqîfîkirinê tê derxistin.

Şêx Seîd bi mîvanî diçe Pîrânê mala birayê xwe Abdurrahîm, li wê derê mufrezeyeke cendirmeyen digirin ser wan û teslîmbûna Şêx Seîd û hevalên wî dixwazin. Lî ew teslîmbûnê qebûl nakin û di navbera wan de şer çêdibe. Ev şer dibe destpêka Serhildana Şêx Sîd.

## AWIR

# Ziwan tenya hacet niyo

**Şarê ke bazarê ci no neteweyî işgal bind bo, îradey siyasiyan ê şaran zeîf beno, çimkî îradey heveyî nirxan ser vejiyeno werte û pay de vindeno. Qandê jewbîna neteweyî têkoşîna siyasi, jewbîna ziwan, çand û dîrok lazim o. Bewne no îradey siyasi ewro tam me bo se ji ûwo vejiyeno werte.**



**S**axa Partiya Demokrasiya Şarî (HADEP) ya Üsküdarî de Gerînendeyê Weşanê yê Azadiya Welat Sami Tanî 26'ê rîbendanî de ‘Mûsayina ziwanê may (Dayik) ser’ jew semîner da.

Sami Tanî qisîyê xo wina akerdi: “Ewro xeylê mardimê ziwanî zey hacete danayîn û girotina zanayinê vînenê. Nê rast niyê, çimkî cayê ziwanî, şaran-dê bindestan het zaf taybet o. Dewletê zordestî bazara neteweyî nê şaran dagir (îsgal) kenê, qandê coya nê, nêşenê jewbînîna xo virajê. Serva jewbînîna neteweyî îradeya siyasi lazim o. Şarê ke bazarê ci no neteweyî işgal bind bo, îradey siyasyê, ê şaran zeîf beno, çimkî îradey heveyî nirxan ser vejiyeno werte û pay de vindeno. Qandê jewbîna neteweyî têkoşîna siyasi, jewbîna ziwan, çand û dîrok lazim o. Bewne no îradey siyasi ewro tam mebo se ji ûwo vejiyeno werte.”

Samî Tanî fina vat ke, verê 1984 de jew kurdê botanî kurdê serhatî ra fahm nékerdê. Çimkî nê pêjewinan het nêşiyê û niyameyê, la balê nê nika jewbînan weş şilasnenê û tayn bo se ji pêjewinan fahm kenê. Gerînendeyê Azadiya Welatî fina vat ke, badê têkoşîna 1984 rojname û kovarê kurdî verî ra bî veşî û nê rojnaman, kovaran û nê hacete ke pêjewinan het, şiyayin û ameyin vejiyay, no ferq tam me bo se ji hewadiyawo. Tanî vat: “Bewnê ewro

MED-TV vengê hemû kurdan resneno pêjewinan. Serva coya ziwan tenya jew hacet nê, pêjewinan fahmkerden het, jewîna çandî het, jewîna dîrok het parçeyê neteweyî yo.”

Ey mûsayina sistêmê tirk ser ji wina vat: “Sistêmê mûsayina tirk asîmîlekar o. Bewnê dewlete qandê asîmîlekerde-nê domananê kurdan mektebê şewîn (yatılı) akerdi. Serva asîmîle kerden heme cadê Kurdistanê de, nê mektebî akerdi, domananê kurdan zordarî bardî nê mekteban û gorey îdeolojiya xo da-yî wenden.” Gerînendeyê A. Welat da zanayen ke, domanê kurdan hetanî 7 serî niyameyî tirkî nêzanê, badê 7 seran şînê mekteb û wija kurdî qisey kerden û kurdî wenden qedexe wo, heta kam kurdî qisey bikiro, mamosay da-nê pîro û ceza danê ci. Ey vat: “Yanê heta 7 serî domanê kurdan ciçî mûsayî se, dewleta nînan çekena jû kişt. Bewnê, ê kê ewro nîjadperestiya tîrkan ke-nê, ê xo tirkî bîle niyê. Ya kurd ê, ya laz ê, yan ji çerkez ê. Nê kot ra wina bî? Nê mûsayindê sistêmê tirk ra wîna biyê.”

Sami Tanî qisey xo wina qedinay: “Gerek hemû kurdî ziwandê xo de qisey bikirê, ziwandê xo de biwanê û bî-nûsê.” Semîner nêzdiyê 40 mardiman temaşe kerd. Bado samî tanî cewabê persanê temaşe kenan da û semîner qedîya.

MEMED DREWŞ

## ÇAVDÊRÎ

AMED TİGRİS



Nivîsa nivîskarê me nekete destê me

## ‘Têkoşîna zimanê kurdî...’

**Agahiyênu ku rojnamevan Özgan di der barê MED-TV'ye de dide objektif û balkêş in. Özgan dide xuyakirin ku, li hin deverên din ji weşanên ku bi kurdî weşanê dikin hene, lê piraniya mirovîn kurd MED-TV'ê tercîh dikin. Dîsa tê daxuyandin ku MED-TV ji aliyê hemû bînerên kurd ve wekî televîzyoneke demokratik tê dîtin.**

**D**i kovara hefteyî Noktayê, di hej-mara bi mîjuya 26'ê rîbenda-nê-1'ê reşemiyê de di bin sernavê “Kürte”nin varoluş mücadelesi (Têkoşîna kurdî ya ji bo parastina hebûna xwe) nivîsek derket. Ev nivîsa ku ji aliyê Güçlü Özgan ve hatîye nivîsin, bi awayekî dûv û dirêj li ser çand, ziman û saziyên kurdan ên çandî rîdiweste. Nivîskar Güçlü Özgan bi serpêhatiyeke xwe dest bi nivîsa xwe kiriye. Özgan di-de zanîn ku di dema rîwîngîya xwe ya ji bo Amedê de di otobûsê de kasete kurdî hatîye lêxistin, lê dema kontrola polisan, ev kaset bi ye-ke tirkî hatîye guhartin. Nivîskar di yar dike ku bi

rûdanîn dawîn kurd bi xwe hesiyane û li ser çand û zimanê xwe xebatê dikin.

Özgan dide zanîn ku serbestiya ziman û çanda kurdî ya ku tê gotin qaşo ye û li ber ziman û çanda kurdî astengîyên mezîn hene. Tê gotin ku bi taybetî li herêma kurdan belavkirina weşanên kurdî pir bi zehmet e. Di nûçeyê de der barê Enstituya Kurdi, Weşanên kurdî yên wekî Azadiya Welat, Nûroj, Nûbi-har, Jiyana Rewşen, Zend, Stîrka Rizgar û saziyên mîna MED-TV, NCM, Med-Kom’ê hin agahî cih digirin. Li ser


mijarê dîtinên Cigirê Serokê Enstituyê Hasan Kaya, Gerînendeyê Gişî yê Ko-vara Zendê Raif Yaman, Endamê Kar-geriya NCM’ê Süleyman Gültekin hatî-ne girtin. Her wiha li ser xebatê ku li Ewrûpayê tê kirin ji hatîye rawestin.

Agahiyênu ku rojnamevan Özgan di der barê MED-TV'ye de dide objektif û balkêş in. Özgan dide xuyakirin ku, li hin deverên din ji weşanên ku bi kurdî weşanê dikin hene, lê piraniya mirovîn kurd MED-TV'ê tercîh dikin. Dîsa tê daxuyandin ku

MED-TV ji aliyê hemû bînerên kurd ve wekî televîzyoneke demokratik tê dîtin. Nivîskar dibêje:

“MED-TV bi hemû zaravayên kurdî, her wiha, erebî, suryanî weşanê dike û ji sedî 40'ê weşana wê ji bi tirkî ye.” Dîsa tê gotin ku li pey stranek arabesk senfonî derdikeve, her wiha tevî ku xeta weşanê sosyalist e ji li ser din û mezhebîn cur bi cur ji bernâme hene. Li gorî nivîsê kurd sedema tercîkirina MED-TV ji wiha didin nîşan: “Heta iro me tu qehremanên xêzefîlman û reşî-kîn amerîki yên ku bi kurdî dipeyîvin nedîstibûn. Ew yek tîne bîra me ku zimanekî me yî xwerû û cuda heye û tehme-ke ku me ‘di jiyana xwe de negirtibû, dide me.’”





**D**i destpêkê de em dixwazin hinekî Mala Haco nas bikin, hûn li ser dîroka malbata xwe dikarin me agahdar bikin?

● Em bi eslê xwe ji Torê ne. Mala Haco, ji bakurê welat pişti Şoreşa Şêx Seid koçî Sûriyeyê bûne. Lê berî ku koç bikin, kalikê min Haco Axa, nêzîkî şes heyvan (mehan) di Çiyayê Babekê de li dijî dewletê şer kiriye. Dûv re mecbûr bûne ku "binxet" bibin. Li Binxetê (Sûri) heta 10–12 salan xanî ava nekirine, li benda efûyê mane ku herin Mîzexê, lê efûya wan ne hat. Ëdî li wir man...

Diya min jî botî ye. Ji gundê Tilê ye, ji Malbata Bilekan. Malbata wan jî mîna ya kalikê min nefi bûn. Hinek ji wan efûya wan hat û gelek ji wan vegeriyan. Lê du xalên min jî, li Başûrê Biçük man. Yê din hemû vegeriyane, niha li dora Dihê (Eruh) dijin.

Dîroka malbata min bi kurtahî ev e. Lê tiştekî balkêş bû ku bavê mir jî, diya min jî, teví ku di ku zarokatiya xwe de ji gundê xwe derketibûn dîsa jî gundê wan tim di bîra wan de bû û tim beh-

sa gundê xwe, behsa bakurê Kurdistanê dikirin. Ji bîr nekiribûn. Dilê wan her tim bi wir ve bû...

*Li Binxetê di warê aboriyê de rewşa malbatê çawa bû?*

● Malbatake zengîn bûn, aristokrat bûn. Gundê wan gelek bûn. Jixwe wê

**E**v hijdeh sal in ku ez li Ewrûpayê dijîm; tesîra muzîka ewrûpî, tesîra kultura ewrûpî li min bûye. Lê di dilê xwe de, di hinavê xwe de, di hîsê xwe de, ez li ser muzîka kurdî ya folklorî mezin bûm. Yanê tu, pêşî tesîra muzîka kurdî di muzîka min de dibînî. Lê tesîra muzîka ewrûpî û ya amerîkî jî baş diyar e.

hingê li ser wî erdî zêde kes tune bû, wê demê fransî li wir bûn. Rabûn ew erd dane kalikê min û eşîra wî. Wekî her axayekî, sedi sed para wî ji yê gundiyan zêdetir bû. Ji tevan, malbata min xwedî pere û zengîn bûn. Lê sîh sal berê, hikûmeta Sûriyeyê erdê wan hemû ji wan stendin. Ü pişt re ketîne halekî pir ne xweş. Min wextê axatiyê nedît, ez pê nehesiyame...

# Guherîm

**Ciwan Haco, di muzîka kurdî de xwediye navekî taybet e. Ligel vê yekê, muzîka ku çêdike xwe hem bi otorîteya muzîkê û hem jî bi guhdaran dide nîqaşkirin. RAHMI BATUR bi riya telefonê têkiîn bi Ciwan Haco re danî û ev hevpeyvîn pê re pêk anî.**

rine?

● Ji sedî sed... Têkiliyê bavê min bi Mir Celadet re, bi Cegerxwîn re gelekk xweş bûn û bi wan rewşenbirê din re jî... Lê ez bi xwe negîham wê têkiliyê, yanê min nedît, ez zarok bûm. Ne rasterast be jî têsîra xwe li min kiriye. Ji ber ku ez bi wê tevgerê hesiyame.

*Navê gundê we û ew li ser kîjan bajarî ye??*

● Tirbespiyê... Ji Qamişloyê 3 km. dûr e, li ser Qamişloyê ye.

*Aboriya gundiyan li ser ci bû?*

● Wekî her gundekî Kurdistanê, aboriya wan li ser çandiniyê û heywanan bû.

*Bi piranî ci diçandin, erdê wan avî bû, bejî bû?*

● Ez hay ji wan meseleyan nebûm ha!.. Bi piranî genim diçandin, piraniya erdê gund bejî bû. Di gund de fileh hebûn, kurdên misilman û êzîdî hebûn, derbaskirina wan a bi hev re, bêpirsiyê bû, ji hev ne xweş nedibûn, di navbera wan de nakokî dernediketin. Jixwe ew jî koçbûyî bûn, ji Bakûr bûn...

*Di gundê we de hunermend hebûn?*

● Aramê Tigran li wir bû. Li Qamişloyê dima, lê gelek caran dihat Tirbespiyê. Min di zarokatiya xwe de, di mala me de li wî gelekî guhdarî kiriye.

*Mihemed Şêxo jî hatibû gundê we...*

● Erê Mihemed Şêxo jî, li dora du salan li Tirbespiyê maye.

*Ez ne şaş bim we bi hev re kasetek jî dagirtiye...*

● Belê di kasetekê de min lê vedi gerandin. Kaset a hunermendê hêja Mihemed Şêxo bû... Min gelek caran goitiye, tesîreke wî li ser muzîka min heye. Min gelek li wî guhdarî kiriye.

*Seid Yûsif dibêje Qamişlo bajarê evîne ye, ev rast e?*

● (Dikene) Dev jê berde lo!.. Pirsa xwe bike!

*Ma ev ne pirs e?*

● Belê heyran, bajarê evîne ye...

*Hûn kengê û di çend saliya xwe de ji gund derketin?*

● Di sala 1957'an de Xwedê ez dame. Di sala 1978'an de jî, ez ji gund

# ewrist bû

derketim

*We li gund xwend?*

● Min li gund dest bi xwendinê kir, heta bi sinifa dehan, sefî yanzdeh û dozdehan min li Qamişloyê xwend. Diya min û bavê min dixwestin ez bibime ebûqat, min li Zanîngeha Şamê qeyda xwe jî çêkir...

*Kurd bi piranî dixwazin ku zarokên wan bibin ebûqat, çima?*

● Ez jî nizanim...

*Serê wan zêde dikeve belayê; ji bo ku wan biparêzin, nebe?*

● Belê... belê ji bo ku wan biparêzin. Lî yê min bi xwe, kêfa min jê re nedihat, ev daxwaza dê û bavê min bû. Ü jixwe ez derketim Ewrûpayê û min nexwend.

*Hûn kengê çûne Ewrûpayê?*

● Di sala 1979'an de...

*We kengê dest bi hunermendiyê kir?*

● Wekî ku min got; li mal tembûr hebû, nayê bîra min ku min kengê dest bi lêxistina tembûrê kiriye. Yanê min ji zarokatiya xwe de dest bi lêxistina tembûrê kiriye û dema emrê min bû çardeh, min kasetta "Emîn e Emîn e" derxist. Ü her serê çend mehan min kasetek derdixist. Ew stranê kurdî ku tirkan ji me dizibûn, xweha min Dîlber Haco careke din ew werdigerandin kurdî û min jî distrandin. Heta niha jî stranê gelek xweş ji min re nivisandine. Weki "Diyarbekir mala min e", "Nisêbîna rengîn", "Lawê min"; gelek stranê xweş...

Min gelek kaset tescîl kirin, lê di sala 1979'an de gava ez hatim Almanyâye, di studyoyê de cara yekemîn min bi profesyonelî kasetta bi navê "Pêşmerge ne em" çêkir. Ew kaset li Kurdistanê baş belav bû.

*Ew a ku Şivan çêkir?*

● Na, Şivan ji min re kaset çenekebine. Di hevpeyvîneke we de ev iðia kîribû: "Kasete yekemîn a Ciwan Haco min çêkir. Ya bi navê Hawar e hawar e birano hawar e."

Ez vê iðiyê ji binî ve red dikim û tênağıhim çima Şivan Perwer vî tiştî dibêje. Rastiya çîrokê ev e: Ez sala 1979'an hatime Almanyâye û li wir min Şivan Perwer nas kir. Di dilê min de derxistina kasetekê hebû û camîrê Şivan bêdudilî xwe da ber ku alîkariya min bike. Ew jî wê deme navekî geleki mezin bû û dezgaha ku vê dawiyê navê wê bû Koma Berxwedan, di bin seroka-tya wî de bû. Stran min bi xwe çêkiri- bûn û hazir bûn. Ji bona ku ez dest bi tomarkirina kasetê bikim, tenê ji min re

sazbend û dirav diviyabûn. Ez dirêj na- kim, bi alîkariya hin sazbendan, Şivan Perwer ku car caran wekî koro jî li min vedigerand, min kaseteke bi navê "Pêş- merge" tomor kir. Ev kaset li gorî ku ez dizanim, hîn derneketiye û sedema nederketinê jî bi baweriya min Şivan Perwer bi xwe bû, ku di vê pirse de xwediyê gotina dawî bû. Bi texmîna min to- mara tenha ji wê kasetê, tenê di destê Şivan Perwer de heye.

Piştî ku ez ji Şivan Perwer bêhêvî bûm, min kasetta xwe ya yekemîn "Pêş- merge" bi xwe ji nû ve tomar kir û der- xist. Kasetta "Hawar e hawar e" ku Şivan Perwer behsa wê kiriye, kasetta min a duyemîn e û tu pêwendiya Şivan pê re nîn e. Ev daxuyaniya min, ji bona xatirê rastiyê û tarixê ye.

*Di navbera vê gavê û deh sal berê de di muzîka kurdî de ci guherîn çêbûne; hûn dikarin bi çavekî nirxandiniyê lê binérin?*

● Guhartin ji sedî sed çêdibin, den- gê nû derdikevin, komên nû derdike- vin. Di muzîka kurdî de tevgerek heye, leptek heye, li ber xwe dide û daîm jî li ber xwe daye... Ne ku di nav wan deh salan de, her daîm di muzîka kurdî de guherîn çêbûne. Bes, guhartin hene te- biî ne, guhartin hene radikal in. Divê em vê bidin ber çavê xwe...


*Hunermend di destpêka hunera xwe de, şopa hunermendekî mezin didomîn; piştî demekê hê xeta xwe datînin. Tesîreke bi vî rengî li ser we jî çêbû, we hunera xwe çawa afirand?*

● Na, tesîreke bi vî rengî li ser min çênebû. Lî dema ez hê ne hatibûm Ewrûpayê, hê li mal jî bûm, min li muzîka ewrûpiyan, ya amrîkiyan guhdarî dikir. Kêfa min jê re dihat. Ji sedî sed ku ez li Terbesiyê mabûma, wê ev kaseten min ne halo bûna. Ev hijdeh sal in ku ez li Ewrûpayê dijîm; tesîra muzîka

aseta "Mirina Egîdek" wê havînê derkeve.  
**Kasetta min a ku piştî heyveke dinê wê derkeve, bi navê "Bilûra min" e. Ji şîra Mîr Celadet hatiye çêkirin. Di kasetê de neh stranê gelêrî û yên modern hene. Min pênc heyvan li studyoyê li ser vê kasetê xebat kir.**

ewrûpi, tesîra kultura ewrûpi li min bû- ye. Lî di dilê xwe de, di hinavê xwe de, di hisê xwe de, ez li ser muzîka kurdî ya folklorî mezin bûm. Yanê tu, pêşî te- sîra muzîka kurdî di muzîka min de di- binî. Lî tesîra muzîka ewrûpi û ya ame- rîki jî baş diyar e.

*Wisa diyar e ku di muzîka kurdî de gotin cihêkî girîng digire; li gorî we se- bebên vê ci ne?*



● Berî her tiştî ne tenê di muzîka kurdî de, bi tevâyî di muzîkê de gotin tiştîkî balkê... Di hinek şekîlîn muzîkê de ji binî tune. Weki senfonî, muzîka klasîk, caz jî bêyî gotinê çêdibe...

Di nav kurdan de belkî gotin bêhtir cih di- gire, ji ber ku kilamên dengbêjan dirêj û bêyî enstrûman têne bikaranîn; hey- ran û tiştîn wisa peyda dibin. Heta kurd çirokên xwe jî, bi stran dibêjin. Ev tiştîkî mumeyîz e, lê ev li cem wan mile-

● Ya rastî ji te re bibêjim; min ev hîzîr, ev texmîn nedikir... Bes, ez însa- nekî serhişk im. Wexta ku ez didime ser riyeke, dîvî ez bibime serî... Yanê çiqasî ez bitehibim (biwestim) jî, çiqasî ez astengîyan bibînim jî, ez li ber xwe didim. Dema min kasetta pêşî çê- kir, (Pêşmerge) muzîka kurdî bi tema- mî xwe tê de diyar kir.

Di vir de dixwazim vê bibêjim: Min şîrîn Rojêna Barnas xwendin, ew hel- besta kurdî ya serbest; bi rastî vî camê- ri tesîreke mezin li ser muzîka min kiriye. Ev şîra wî ya bi navê "Min navê xwe kola li bircêni Diyarbekir" kete destê min. Tu nikarî vê şîrî bi awayekî tam kurdî, folklorî çêkî. Ez mecbûr mam tiştîkî nû çêkim. Ew bû destpêka muzîka min ku ez rengekî bidime xwe, stîlekî çêkim. Wexta ku min kaset çê- kir ev stîla nû, ev enstrûman ji kurdan re gelekî xerîb xuya dibû. Digotin ev ci ye, ma tu şaş bûyî! Ew ê pêşiyê min enstrûmanen xerîb, yêne ewrûpî bi kar anîn. Ji kurdan re tiştîkî xerîb bû, lew- ma jî şerî wê dikirin. Lî ev ji mecbûr bû, ev ji kurdan re pêwist bû (lazım)... Ev guherîn pêwist bû û pêwist bû ku yekî dest pê bikira, min dest pê kir; ji ber vê jî, min gelek zehmetî dîtin.

Dûmahîk rûpel 15

# Helbestvan û rewşenbîrekî çiyayî

# Mihsin Qoçanî

**M**irov, axayê xweristî ye. Ciwantirin ahe di evî kewnî da, li demê serxwebûnê, lê dibit kirêttirin tişt li demê helweşyanê. Rengên helweşyana mirovan gelek in û keşefrêttirin reng helweşyana mirovatiya mirovi ye.”

Wisa dibêje Mihsin Qoçanî, di pêşgotina helbesta xwe ya ‘Helweşyan’ de ku di duwemîn pirtûka wî ya bi navê ‘Wêneyek ji filmekî pir çiayî’ de cih digire.

Berî destpêkirina vê danasînê, ez dixwazim taybetiyeke Mihsin Qoçanî bidim xuyakirin. Helbestvanê me di gêra zimanê kurdi de pir şareza û pehlîwan e. Gencîneya wî ya peyvan dewlemend e.

Belê bikaranîna devokê herêmkî di helbesta xwe de, li dev Mihsin Qoçanî berî her tiştî tê. Di baweriya min de ev egera ye ya ku helbestvanekî wekî Mihsin Qoçanî, bes di devera Behdînan de asê kiriye û ew bêdeng hiştiye. Heger na, ez dikarim bi sanahî bibêjim ku Mihsin Qoçanî di ristina helbesta serbestî bêkês de helbestvanekî payebilind û berbiçav e û wêneyê wî yên helbestî cihê pesindanê ne.

#### Helweşyan

Rik û viyan

Di hîzrén min de pêk ve razan.

Ez pê dihesim di xiloleya sîngê min da  
Xo têk dihîsin

Guhnelê dîkin wek ‘Îblîsa’  
Têjka dînin bêrawestan.

Ji viyanê ye

Ji viyanê ye.

Bi ristina van çend peyvîn ciwan, helbestvanê me wêneyê çîrokeke dûr û dirêj ya diyalektîkê bi kurtayî anîye ziman. Di cihekî de cihgirtina du dijayedîyan û piştî demekê anîna têjîkan (çêlîkan). Helbet, anîna çêlîkan jî berhemâ dan û standineke di navbera nêr û mî de ye, angô berhemâ evînekê, yên hezkirinekê ne ku di his û ramana helbestvanê me de cih girtine.

Ez bêjyêd te (pora te)

Bejna te ya ter û nazik

Li her du destê xo dialînim

Bejna te ya ter û nazik

Ser ïsteka swîsebera

Berovajî dikem, dixirînim.



**Helbestvanê me di gêra zimanê kurdi de pir şareza û pehlîwan e. Gencîneya wî ya peyvan dewlemend e. Belê bikaranîna devokê herêmkî di helbesta xwe de, li dev Mihsin Qoçanî berî her tiştî tê. Di baweriya min de ev egera ye ya ku helbestvanekî wekî Mihsin Qoçanî, bes di devera Behdînan de asê kiriye û ew bêdeng hiştiye.**

Di xewnen xo da

Te dihincinim

Pirtikên te dideme ber êk

Da carek dî bihîn lêkdan

Ji bo rikmane

Rojê sed car

Te serda dibem

Te li hewrekî reş mar dikem

Hekû hewr aviz dibin

Te zwîz dikem

Bi sed telaqan dideme berdan

Di cihekî de cihgirtina du dijatiyan.

Jiyan rikmane ye di navbera du tiştan

de. Di şoresekî de cîgirtina zengi hejaran û piştî gihiştina qonaxek serdebirin, ango xapandina aliye aliye dîtir ve. Yan jî, ji layê seretiya siyasi ve, ji bo parastina be wendiya xwe ya taybet, têk biri hederkirina ked û westana salawan mirovîn dilpak ku ji bo armeceke pîroz, ji bo bi hev perçimkir welatekî parçebûyi li dor tevgem kom bûbûn.

#### Bi kurtayî

#### jînenîgariya wî

Helbestvanê me di sala 1954 de li devera Dihokê li gundê Bamîne ji dayik bûye. Xwendîna xwe seretayî, navîncî û amadeyî li bajî Mûsilî bi dumahîk anîye.

Di sala 1976'an de, Danışgî Kiştûkalî (Fakulteya Zîraetê), Zankoya Mûsilî qedandîye. Ji 1970'yi û pê ve dest bi ristina bestan kiriye.


Ji destpêka salên 1980'yi û pê di nav rîzîn PDK'ede, wekî pê mergeyekî bi karê xwe yê netewrabûye. Di dema pêşmergetiyê yekemîn diwana xwe ya bi ‘Befra li vêrê’ weşandiye.

Piştî serîhildana 1991'ê, wî rewşenbîrekî kurdperwer bi karê barê rewşenbîrî rabûye û di kovî rojnameyên kurdi de xebitiye. di vê salê de digel hînek heva xwe, li bajêrê Dihokê rojnamey hefteyî bi navê Botan û rojname ke wextî bi navê Nûxwazî derdi tin.

Digel pêşdeçûna weşanê û çan meniyê li başûrê Kurdistanê, bestvanê me di ‘Televîzyona Kî distan’ de wekî gerînendeyê tele yonê xebitî.

Di sala 1994'an de duyemîn pî xwe ya helbestî li jêrnavê ‘Wêneyek’ filmekî pir çiayî’ weşand. Teme ez dizanîm helbestvanê me sêye pirtûka xwe ya helbestî jî ji bo amade kiriye. Komeke lêkolmînê ser edeba kurdi jî hene.

Di encam de, Mihsin Qoçanî ne helbestvanekî dilovan e, her wisa lemşorekî delodîn e, berevanekî çê e ji bo parastina demokrasî û mafîrovan li deverê. Niha jî helbestvanekî endamê Yekîtiya Nivîserên Kî li bajêrê Dihokê dimîne.



Li navendê çandê çalakiyên vê hefteyê  
Li NÇM'ya Stenbolê

● 2.2.1997 Yekşem: Konsera Koma Amed, saet:14.00

Teatra Jiyana Nû: Bayê Elegezê, saet:17.30

● 5.02.1997 Çarşem: Ji Zanîngeha Azad semîner: "Canavarlaşan Medya (Medaya ku dibe cinawir)", Temel Demirer, Hüseyin Aykol, saet: 18.00

● 7-22.02.1997 În: Pêşengeha wêneyan a hevpar: Alpaslan Algan, Mustafa Ümit Şanal, Haydar Özay, saet:15.00  
Film: Katil doğanlar (Kesên ku kujer tê dinyayê); saet:18.00

● 8.02.1997 Şemî: Konsera Dengbêj Seyda, saet:14.00

Teatra Jiyana Nû, Bayê Elegezê, saet: 17.00

Li NÇM'ya İzmîrê

● 2.02.1997 Yekşem: Teatra Dengê Bahozê: 'Hêviya me hûn in', saet: 17.00

● 5-11.02.1997 Çarşem: Peşengeha wêneyan a Ayten Köse

● 6.02.1997 Pêncem: Teatra Arzeba 'Jinê Bindest', saet:18.00

● 7.02.1997 În: Teatra Arzeba, saet:18.00

● 8.02.1997 Şemî: Teatra Arzeba, saet:18.00

## RÜDAN

# Panela bûyera 49'an

**Serokê Belediyeya Licê yê berê Nazmi Balkaş ji bo çawanî û helwesta tevgera 49'an wiha peyiî: "Kesên di nav bûyera 49'an de bi awayekî têr û serbilind xwe parastin û li kurdîtiya xwe xwedî derketin.**

Ji ber salvegera "Bûyera 49'an" di 25'ê rêbandana 1997'an de li NÇM'ya Stenbolê, şaxa Beyoğlu panelek hate lidarxistin. Panel bi başdariya Dr. Tarık Ziya Ekinci, Niviskar Naci Kutlay, Parêzer Canip Yıldırım, Serokê Belediyeya Licê yê berê Nazmi Balkaş, Endazyar (muhendis) Esat Cemiloğlu bi eleqedariyeke mezin pêk hat. Panel ji aliye Berpîrsê Karê Nivîsaran ê Azadiya Wela, Düzgün Denizve hate birêvîbirin.

Niviskar Naci Kutlay, di axaftina destpêkê de, bi nirxandineke dîrokî, pêvajoya dema osmaniyan û cumhûriyetê nirxand. Wî da zanîn ku, di nav kesên ku Partiya İttihat û Terakîyê dameziranîne de kesên tirk nîn in û di gel her tişti, di wê demê de kurd ji aliye çandî û civakî ve bi pêş ketine, dibistan hatine vekirin, kovar û rojname hatine derxistin, lê belê bi desthilatdariya kemalistan navber dikeve vê pêvajoyê û rî li ber pêşveçûnê tê girtin. Kutlay, girêdayî wan nirxandinê dîrokî wiha axivi: "Bi fitnekariya osmaniyan, kurdan di tevküjiya (qetliam) ermeniyan de rolên geleki xerab bi cih anîne. Divê em vê yekê bi awayekî bêkompleks li xwe deynin."

Niviskar Naci Kutlay, rewşa piştî şerî duymen jî nirxand, diyar kir ku, mebusen herêmên kurdan bi piranî kesên leşker bûne û ji aliye mirovîn herêmê ve nedihatine naskirin. Piştî sala 1950'yi ji herêmên kurdan kesên feodal û aristokrat wekî mebûs hatine hilbijartîn. Kutlay, tevgera 49'an wekî tevgera ronakbîrîn birjûvayêن büyük bi nav kir û ji bo têkoşina neteweyî ya kurdan wekî tingehe nîşan da.

Nazmi Balkaş ji, di axaftinê xwe de pêşî eş û azarêñ girtîgê vegotin. Balkaş, ji bo çawanî û helwesta tevgerê ji diyar kir ku di hav tevgerê de ji her cîn û tebeqeyê mirovan cih girtiye. Balkaş wiha peyiî: "Kesên di nav bûyera 49'an de bi awayekî têr û serbilind xwe parastin û li kurdîtiya xwe xwedî derketin. Girtina me bîryareke siyasi bû. Em karin tevgerê wekî tevgera ronakbîrîn birjûvayêن büyük bi nav bikin. Li holê rexistinêk tune bû. Lî, ev tevger ji bo pêşerojê bû tingehe. Ev kes niha di nav tevgerê kurd de cihêñ gîring digirin."

Her wiha Balkaş da zanîn ku, di girtina wan de rola İsmet İnönü û Türkçe mezin e.

Di panelê de, kurê Cemil Paşa, Esat Cemiloğlu bi çiroka jiyana xwe, sêweyê axaftina xwe geleki bal kişand û hate ecibandin. Cemiloğlu, bi helbesteke dirêj rewşa girtî û girtîgê anî zimên. Esat Cemiloğlu li Fransayê li ser çandîniyê perwerdehî dîtiye û li ser navê Tirkiyeyê beşdarî şampiyoneyen boksoriyê bûye. Cemiloğlu di kiloya xwe de bûye şampiyonê cihanê. Ev beşa sporê bi destê Esat Cemiloğlu li Tirkiyeyê cih û bingeh girtiye.

Piştî Cemiloğlu Parêzer Canip Yıldırım axivî. Parêzer Yıldırım bûyera 49'an, bi armanca guhartina rojevê ve girê da. Da zanîn ku, bûyer li dijî desthilata Menderes hatiye bikaranîn. Yıldırım wiha gotina xwe domand: "Leşker û rêvîbirên tirk ji têkoşîna kurdan geleki ditirisin. Ji ber ku aboriya Tirkiyeyê bi Rojhîlat û Rojhîlat Başûr li ser piyan dimîne."


Di panelê de axivger dawîn Dr. Tarık Ziya Ekinci bû. Ekinci bi taybetî li ser pêvajoya têkoşîna kurdan ya neteweyî rawestiya. Diyar kir ku, di dîrokê de qutbûyîn (navberdayîn) nîn e. Di têkoşîna kurdan de piştî Serhildana Dêrsimê qutbûyîn û vemirîn pêk nehatiye û bi awayekî sergirtî berdewam kiriye. Ekinci li ser çawaniya tevgerê ev tişt gotin "Di destpêkê de tevger ne xwedî idêolojiyeke xurt û hevgirtî bû. Tevgerê reaksiyoner bû. Lî di girtîgê de nakokiyêni di navbera 49'an de zelal û tûjtir dibin."

Dr. Ekinci der barê guherîna helwesta tevgera kurdan a siyasi de jî wiha peyiî: "Me berê piştigiriya DP (Demokrat Partisi)'ê kir. Berî iktidarbûyînê Koraltañ ji Faik Bucak re gotiye: Emê mafêñ kurdan yêñ demokratik binasîn. Lî, tu tişt neguherî. Piştî van rûdaran me piştevaniya CHP'ê kir. Me bi salan CHP wekî partieneke zordar û xayîn bi nav kiri-bû. Ev guherîneke mezin bû ji bo me." Panel bi axaftineke nirxadinî ya Berpîrsê Karê Nivîskaran ê Azadiya Welat Düzgün qedîya.

EŞREF SÎDAR

## TÎSK

BEKIR BAHOZ



## Awirêk le kobûnawekanî Enqere

**Y**eketi Nişîmanî Kurdistan (YNK) û Partî Demokraî Kurdistan (PDK), diway xwênaîtirin şerî xokûjî û malwêranî kurdan, be hoy gûşarî Türkiye û le ser daxwazî Amerika le Enqere çend carêk kobûnewe.

Ew du parte kurdîa hemû core nawbijîyekî part û rêkxrawe nişîmanperwerekâniyan ret kirdewe. Sereray têperbûnî sedan sal, keçî lojîk û eqliyetî seranî kurd goranî be ser da nehatiye. PDK destî artêşî Îranî girt û lê naw xakî be naw azadkîraw da hênanî bo ewey hêris binke serbaregakanî oposisyonî kurdî Rojhîlat le başûrî Kurdistan

Helbet ew refare, ziyânêkî zorî geyand be helwêstî YNK le ser astû Kurdistanî gewere.

Diwa be diway ew hengawey YNK, PDK gewretirîn hengawî xiyanetkareney hawîst le mêtjû netewey kurd da, çekdarekanî ew parte, be siwarî tankî arteşî Iraq şarî Hewlêrî paytextî Kurdistaniyan dağır kirdewe, be pêy hawalêkî rojnamey erebî zimanî El-Hayat, efserêkî payebilindî supay Iraq desteyek çekdarî PDK'ye le dewrûberî baregay yekemîn parlemanî be resmî helbijêdirawî kurdî danawê û pêy witûn: "Erê biparêzin û namawê be hîç corêk be kurdî qise biken." Ay ke çend şermekî mezin e diway 5 sal azadî û jîyanî dûr le Bass, carêkî tir şîlî lew babete be kurd biwitîrê û hokarîs kurd bo xoy bêt!

Rûdawekan her be dagîrkirdinewey Hewlêrewe newesta, belkû her du parti riqber le mawey du mang da xwênaîtirin xûlî şerî kurd kûjiyan be rî we bird. Be corê kar geş be ewey Amerika hestî kird berjewendiyekanî le herêmeke, le metîrsî da ye, boye be pele û yet be diway yet da, her du seranî PDK û YNK'ye bang kird bo Türkiye.

Wefî her du la ta êsta le Enqere, sê xûlî kobûneweyan encam dawe, ke çawdêr le derewey rûdawekanîne bo mijareke derwanêt û giwê le qise û lêdwanekeanî her du wefî YNK û PDK û Türkiye dagrêt, wa hest dekat ke her du parti boye mawey du sal û nîw dij be yet şeriyan kirdiye bo ewey êsta bêne Türkiye û le wê wa nîşan biden ke tenya girûgirtî başûrî Kurdistan Partî Kirêkaranî Kurdistan (PKK) ye. Ne Türkiye û ne layene kurdîyekanî ewendey basî rû be rû bûnewey PKK û daxistinî ordugay Etrûş-yan kird, ewende basî dozînewey rîgeçareyekîyan nekird bo kêşekanî Başûr û birînewey asewarekanî şerî nawxo.

Le hîç kes û layenêk şarawî niye ke Türkiye her le seretay raperînî beharî 1991 we ewperi tiwanan xoy bo le barbirdînî ezmûni Başûr xistote kar, her hewlêkî dabêt bo ragirtînî şerî nawxo, bo ewe bûwe ke hêzeganî Başûr bikat be gjî PKK da. Belam emcar Türkiye hewl dedat be berdêk du çoleke bikûjêt, le layeke we lêzekenî Başûr dij be PKK han bidat û le layekî tire we mijarî turkman bênete gorê û biyankat be hewbêî kurd le birêwebirdinî herêmeke da, eme bo katî êsta, bo diwa dojîş Türkiye nexşey ewe dekêşet ke eger kurdî Başûr rojê le rojan core serbexoyek be dest bixat, em bitwanêt hemîşe rewşî Başûr be pêy wîst û arezûy xoy kontrol bikat. Her weha Türkiye deyewêt be ray giştî cihanî nîşan bidat ke danıştiwanî ew beşey Kurdistan tenya kurd nîn, belku turkmanîş hen, ewîş bo ewey kesekey kurd le başûr büyük bîkrêtewê weku seretayek bo lenawbirdinî.

Serkewtin yan semekewtinî nexşê û projekanî Türkiye bend e be helwêst û biryârî parte kurdekan be giştî û YNK û PDK be taybetî, eger ew du layene nakokiye kanyan bixene lawe û berjewendiyekanî tesk û tengî hîzbayetiye, min lew birwayedam ke detwanîn rû be rûy Türkiye rawestin û rî neden nexşê gilawekanî lemer Başûr bixate jîyanew. Mêjû şahid e, her katêk kurd piştî le yet kirdibêt û hanay bo dujmin birdbê, hemîşe besî nûşût buwe û jîr dest mawetewe, eger yekîşî girtbêt hîç lêzék xoy le ber da negirtiye.



# Keda mirov

**R**ojekê ji rojan di welatekî de padışahî aqilmend û kurê wî dijîyan. Padışah mirovekî gelek zana bû. Kurê paşê jiyanekê beredayî dijiya. Ew rojekê hat cem bavê xwe û jê re got:

— Bavo, daxwaziyeke min heye. Ez dixwazim bizewicim.

Padışah hinek fikirî û ji kurê xwe re got:

— Belê kurê min. Tu dixwazî bizewicî, ser seran ser çavan. Lê belê sertekî min heye. Heger tu karibî vî sertê min bînî cih, tuyê bizewicî.

Li ser vê gotina paşê, kurê padışah gelek dilşad bû û sertê bavê xwe pirs kir. Padışah sertê xwe got:

— Kûpeki tijî zér heye. Heke tu vî kûpê zér biavêjî deryayê, ezê te bizevicinim.

Kurê wî bi rûyekî ken bersiv da:

— Ser çavan bayo. Ez hema vî kûpî diavêjîm deryayê. Ev sertê te jî gelekî hêsan e.

Kurê paşê gelekî bi kêfxweşî, kûpê zér dibe diavêje deryayê û bîlez tê ba bavê xwe û dibêje:

— Bavo, min sertê te anî cih. Min kûpê zér avête deryayê. De min bizewicîne.

Padışah dest bi xeberdanê dike:

— Belê kurê min. Te sertê min ê yekêmîn anî cih. Baş e. Sertê min ê duymîn jî heye. Heke tu sertê min ê duymîn jî bînî cih, ezê te bizevicinim. Sertê min ev e: Hinek cil, sol, gore hene. Ji te re hefteyek muhlet. Gerek e tu di nav hefteyekê de van cil, sol û goreyan li sûkê (pazarê) bifiroşî. Di dawiya vê firotinê de ci pere ket destê te, bîne bide min.

Kurê paşê şas bû û ji bavê xwe re got:

— Bavo ez kurê paşê me. Ezê çawa li sûkê cil û milan bifiroşim. Ne şerm e?

Padışah keniya û got:

— Heke tu dixwazî bizewicî, pêwist e ku tu vî sertê min jî bînî cih.

Kurê paşê gelek aciz bû. Lê belê sertê duyemin jî qebûl kir. Kurê padışah bi hêrs rabû kinc, sol û gore hildan ser milê xwe û çû sûkê. Ji bo firotina kincan destê xwe da ber devê xwe û dest bi bangê kir. Ji sibê heta êvarê bang da, lê qet kesekî ji wî tiştek neswend. Dema bû êvar, kurê padışah bi hêrs û westiyayî zivirî malê. Heft rojan li ser hev çû sûkê û hat. Gelek westiya. Şîrê dayika xwe yê ku mîtiyabû di pozê wî re hat. Di dawiyê de kinc û sol fi-

rotin.

Kurê padışah, dawiya firotina kincan bi lez û bi kêfxweşî hat cem bavê xwe.

Padışah:

— Kurê min, aferîn ji te re. Sertê min ê yekêmîn tê bîra te. Kûpeki tijî zér hebû. Te ew avêtibû deryayê.

Kurik:

— Erê bavo, di bîra min de ye.

Padışah:

— Belê ev hefteyek e tu gelek xebitî û te di dawiyê de kinc firotin. Sertê min ê sîyemîn jî ev e: Pereyên te qezenc kîrine, tu bibî biavêjî deryayê. Tu vî sertê min jî bînî cih, ezê te bizevicinim.

Li ser vê gotina padışah, kurik gelek aciz bû û bi hêrs ji bavê xwe re got:

— Bavo, bavo tu ci dibêjî? Ezê çawa van pereyan biavêjîm deryayê? Ez hefteyekî ji şeveqa sibê heta êvarê dixbîsim. Binê lingên min tev bûn birîn. Ez tu carî van pereyan naavêjîm deryayê. Tu dixwazî min qet nezewicîne!

Padışah acizbûna kurê xwe dît û biken:

— Belê kurê min, te di dawiyê de rind fêm kir, keda mirov ji mirov re zehf şerîn e.

ŞEVKET KAHRAMAN

# Sêr û Rovî

**R**ovî rojekê derdikeve ger rastî şêr tê. Dema şêr dibîne pir ditirse. Ji xwe dibêje: "A niha wê şêr min parça bike." Şêr gazî rovî dike dibêje: "Rovî tu li cem min naxebitî?" Rovî bi dilekî kul, wiha dibêje: "Çawa axayê min ezê li cem te bixebeitim û lavahiy jî bikim."

Rovî dikeve pey şêr û têr ware mexelê yê şêr. Rovî ji şêr dipirse "Axayê min ka ezê ci karî bikim. Ji min re bibêje, êdî ez dest bi karê xwe bikim."

Şêr bersiva wî dide: "Rovî, tuyê her roj carekê binê min pag bikî û stûyê min mist bidî. Ezê ji herim pêsiya karwanan nêçîrê, min ci anî emê bi hev re bixwin."

Rovî xwestekê şêr dipejirine û dest bi mistdana stûyê şêr dike. Pûrta şêr gjî dibe, çavên wî sor dibin û şêr ji rovî dipirse: "Rovî, li pûrta min binihêre ka gjî bûye." Rovî dibêje: "Belê axayê min, gjî bûye." Dîsa dipirse: "Çavên min sor bûne?", Rovî "Belê axayê min sor bûne." Şêr, êdî bi xwe bawer dibe ku bi hêz bûye.

Radibe ser xwe û diçe pêsiya karwan. Deveyekê li erdê dixe û tîne, ew û rovî bi hev re dixwin.

Rojê wan wisa derbas dibin, wext dibore rojekê şêr dimire. Rovî jî, gelek qelew û bi hêz bûye û xwe di şûna şêr de dibîne. Ew li çolê digere, vir de diçe, wir de diçe rastî roviyekî din tê, ji rovî re dibêje: "Rovî tu li cem min naxebitî?" Paşê jî şertê xwe jê re dibêje. Rovî wan şertan dipejirine û her du rovî bi hev re têr mala roviyê ku xwe di şûna şêr de dibîne.

Xulamê wî piştî wî mist dide, qederek di ser de diçe, roviyê xwedîyê malê dipirse: "Rovî pûrta min gjî bûye?" Roviye xulam dibêje: "Belê gjî bûye." Roviye axa dîsa dipirse: "Çavên min sor bûne?" Yê dî dîsa dibêje: "Erê!" Li ser van gotinan baweriya wî bi wî tê û qevazekê dide xwe, diçe pêsiya karwan, xwe li bin guhê deveyekê dide, deve pehînekê lê dixe, rovî dipeke li erdê dikeve. Roviye din tê ser cendekê axayê xwe û dibêje: "Axayê min, dema ku min piştî te mist dida; ne pûrta te gjî bûbû û ne jî çavêni te sor bûne. Belê a niha hem pûrta te gjî bûye, hem jî çavêni te sor bûne."

HİŞAR BAKER

# Hejmara Lêkolînê a nû

Lêkolîn  
Enstituya Stocholmê

Divê bê gotin ku Lêkolînê wekî weşaneke xwerû bi kurdî dest bi jiyanâ xwe kir, lê mixabin di hejmara sisiyan de ji sedî 80'yê nivîsan bi zimanê biyan in. Bi dîti-na min, enstituyek dikare bi zimanê cur bi cur weşanan derxe, lê divê weşana bingehîn bi zimanê gelê ku navê xwe daye enstituyê be.

heye. Ev gotara bi navê "Between Europe and Asia the Kurdish Question (Di navbera Ewrûpa û Asyayê de Kêşaya Kurdî) bi îngilizî ye û di konferansa navneteweyî ya bi "Kurdistan: Prospects for Peace (Kurdistan: Perpektifîn ji bo Aştiyê) de hatiye xwendin. Ev konfe-

rans di 5-7'ê tîrmeha 1996'an de pêk hatiye. Di vê gotarê de tiştên balkêş hene li ser rewşa kurdi ya siyasî û dîrokî. Mixabin ev nivîs ne bi kurdi, bi tenê kurdênu ku bi îngilizî dizanîn dikarin jê sûdê wergerin. Li aliye din Îzedîn Nasso ji bo "Yada 50 saliya damezirandina Komara


Kurdî ya Demokrat (Mehabad)" nivîsek amade kiriye ku tê de li ser mercen demê û dîroka vê komara kurdi tê rawestîn.

Ji bili van nivîsan du nivîsên bi almanî di vê hejmara kovarê de cih digirin. Ji van nivîsan yek ji aliye Xemgîn Bîrhat ve, ya din ji hêla-Sükru Alkan ve hatiye nivîsin.

Di vê hejmara kovara Lêkolîn de nivîsek jî bi tirkî heye. Ev nivîs ji aliye Sıraç Bilgin ve hatiye nivîsin. Navê vê nivîs "Güneşin Çocuklarına Zarathustra'nın Gathaları Avesta ve Kürtçe (Ji Zarokên Rojê re Gata-yân Zarathustra Avesta û Kurdî)" ye. Sıraç Bilgin li ser vê mijarê pir-tukek jî nivîsiye û ev pirtûk di nav weşanê Doz de derketiye.

Divê bê gotin ku Lêkolînê wekî weşaneke xwerû bi kurdî dest bi jiyanâ xwe kir, lê mixabin di hejmara sisiyan de ji sedî 80'yê nivîsan bi zimanê biyan in. Bi dîti-na min, enstituyek dikare bi zimanê cur bi cur weşanan derxe, lê divê weşana bingehîn bi zimanê gelê ku navê xwe daye enstituyê be.

SAMÎ BERBANG



## Avaşin

Kovara çand û hunerî ya Enstituya Stocholmê bi hejmara xwe ya payiza 1996'an derket pêşberî xwendevanê kurd. Di vê hejmara kovarê de gelek nivîsên ji şaxê wêje û hunerî hene. Bo nimûne di vê hejmarê de nivîseke bîrânîn ya Dr. Hezîn Haco bi navê "Çend wêne ji jiyanâ gorbihuşt Nayîf Haco, çirokeke Zana Farqînî, helbesten Mezher Bozan, H. Sefkan, Yekzan di vê hejmara Avaşin de cih digirin. Li aliye din gelek gotarên siyasi û civakî balê dikişin. Niqaşa li ser rewşenbîriya kurdan di nav rûpelên Avaşin de jî ji xwe re cih dîtiye. Nivîsa M. Eli Tüysüz a bi navê "Ronakbîr, ronakbîr û siyaset li ser vê babetê ye. Piraniya kesen ku ji bo Avaşin dinivîsin ji aliye xwendevanê Azadiya Welat ve baş tê nasîn, lewre ew di vê rojnameyê de jî dinivîsin. Bo nimûne mamosta Amed Tîrgîs, Dilbixwîn Dara, Mirhem Yiğit û hwd.

Di vê hejmara kovarê de mesaja Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan a ji nivîskarên kurd re, axaftina ku İsmet Şerif Wanlı di vebûna enstituyê de kiriye, mesajen ku ji enstituyê re hatine şandin û destûrnameya Enstituya Stocholmê ji cih digirin. Dîsa nivîsa J. Espar ya li ser meşa rewşenbîran a ji Bonnê ta Brukselê tekane nivîsa bi kirdki ye.

Hejmara sisiyan a weşana Enstituya Kurdî ya Berlinê Lêkolîn derket pêşberî xwendevanen. Di vê hejmara kovarê de mijarênu cur bi cur bi zimanê cuda cih digirin. Pişti pêşgotina ku ji layê redaksiyonâ kovarê ve hatine nivîsin, gotareke İsmet Şerif Wanlı

rans di 5-7'ê tîrmeha 1996'an de pêk hatiye. Di vê gotarê de tiştên balkêş hene li ser rewşa kurdi ya siyasî û dîrokî. Mixabin ev nivîs ne bi kurdi, bi tenê kurdênu ku bi îngilizî dizanîn dikarin jê sûdê wergerin. Li aliye din Îzedîn Nasso ji bo "Yada 50 saliya damezirandina Komara

berhemên nivîskaran bêjing bikirana. Baş û ne başên wan, sist û xurt, xweş û ne xweş, hêja û ne hêjayên wan ji hev cuda bikirana.

Bêjingeke bi vî rengî zor pêwist e di vê demê de, ji ber ku gelek kes xwe bi navê "nivîskar" nîşan didin, ê eger karibin du sê pirsan li hev bînîn, dilezînin nêziktirîn çapxaneyê û wekî nanekî ji keva (ango hêvîrê wî baş tîrs nebûye) derdixînîn.

Eger ev bêjinga ku ez doza wê dikim hebe, wê bêguman gelek sûd û feyde jê peyda bibe, li aliyeji ji bo nivîskaran û li aliye din ji bo xwendevanen.

Hîn em hîn bêjingkirinê nebûne û eger yek rabe nivîseke me rexne bike, çav li me sor dîbin û kef bi ser devê me dikeve û ji haş û baş em peyvan dibêjin.. Kes newêre ji nivîskarekî re bêbe: Pozê sola (nivîsa) te xwar e.

Eger cesaretê bike û bibêje, nivîskar û rexnevan wê bibin dijiminê hev, tu dibêji qey bavê hev kuştine. Di bin çavan re li hev dinêrin û diranan li hev çic dikin.

Divê em xwe hîn rexneyan bîkin û ji bêjingan netirsin. Û bila em doza bêjingê her dem bikim, ne tenê di warê nivîsandîn de, lê di warê jiyanâ civakê de jî, di warê siyasetê de jî, bi kurtayı, di her warê jiyanâ me de.

Ez bi hêvî me tu kes vê nivîsa min şas fêm neke, ez xweş nas dikim zimandirêjî tiştek e û rexne tiştek e.

Mixabin, bi rengekî zanistî hîn bêjing nehatiye meydanê û ji ber vê-yekê gelek zîwan di nav çewalên me de heye, hin çewal jî tev de zîwan derdikevin.

## Bêjing

JAN DOST



Tê bîra min, diya min genim bêjing dikir. Genimê zekâtê jî wekî hûn dizanîn, genimê herîne baş e. Tevde zîwân û kwîrik û qırşık e. Ne ji bo nan dibe û ne jî dibe êm ji sewalan re. Ez serê we neêşînim. Diya min rehmetî ew genim (bi nav genim e) bi hostebûn bêjing dikir. Wê digot: "Ez genim werbêj dikim", ango parçeyên hûr dadiketin jêr û qırşîkên sivik bi ser bêjingê diketin û di nêvî de genim pak dima. Îcar ci zîwana mayî ji navê dineqand û genimê mayî ji bo ard dihişt.

Ew karê diya min tê bîra min, îcar ez dibêjim: Xwezî bêjingek hebûya, me pê

berhemên nivîskaran bêjing bikirana. Baş û ne başên wan, sist û xurt, xweş û ne xweş, hêja û ne hêjayên wan ji hev cuda bikirana.

Bêjingeke bi vî rengî zor pêwist e di vê demê de, ji ber ku gelek kes xwe bi navê "nivîskar" nîşan didin, ê eger karibin du sê pirsan li hev bînîn, dilezînin nêziktirîn çapxaneyê û wekî nanekî ji keva (ango hêvîrê wî baş tîrs nebûye) derdixînîn.

Eger ev bêjinga ku ez doza wê dikim hebe, wê bêguman gelek sûd û feyde jê peyda bibe, li aliyeji ji bo nivîskaran û li aliye din ji bo xwendevanen.

Hîn em hîn bêjingkirinê nebûne û eger yek rabe nivîseke me rexne bike, çav li me sor dîbin û kef bi ser devê me dikeve û ji haş û baş em peyvan dibêjin.. Kes newêre ji nivîskarekî re bêbe: Pozê sola (nivîsa) te xwar e.

Eger cesaretê bike û bibêje, nivîskar û rexnevan wê bibin dijiminê hev, tu dibêji qey bavê hev kuştine. Di bin çavan re li hev dinêrin û diranan li hev çic dikin.

Divê em xwe hîn rexneyan bîkin û ji bêjingan netirsin. Û bila em doza bêjingê her dem bikim, ne tenê di warê nivîsandîn de, lê di warê jiyanâ civakê de jî, di warê siyasetê de jî, bi kurtayı, di her warê jiyanâ me de.

Ez bi hêvî me tu kes vê nivîsa min şas fêm neke, ez xweş nas dikim zimandirêjî tiştek e û rexne tiştek e.

Mixabin, bi rengekî zanistî hîn bêjing nehatiye meydanê û ji ber vê-yekê gelek zîwan di nav çewalên me de heye, hin çewal jî tev de zîwan derdikevin.

## Bêjing

JAN DOST



Tê bîra min, diya min genim bêjing dikir. Genimê zekâtê jî wekî hûn dizanîn, genimê herîne baş e. Tevde zîwân û kwîrik û qırşık e. Ne ji bo nan dibe û ne jî dibe êm ji sewalan re. Ez serê we neêşînim. Diya min rehmetî ew genim (bi nav genim e) bi hostebûn bêjing dikir. Wê digot: "Ez genim werbêj dikim", ango parçeyên hûr dadiketin jêr û qırşîkên sivik bi ser bêjingê diketin û di nêvî de genim pak dima. Îcar ci zîwana mayî ji navê dineqand û genimê mayî ji bo ard dihişt.

Ew karê diya min tê bîra min, îcar ez dibêjim: Xwezî bêjingek hebûya, me pê

# Çend pêkenokên kurt

## Her roj ker namirin

Zilamek diçe aşxaneyê bi buhayê pêncî qurişî xwarinê dixwaze. Firaqeketijî goşt tînin jê re. Zilam dibêje ev aşxane gelek erzan e. Ezê her roj bême vê derê xwarinê bixwim. Roja paştar dîsa diçe wê aşxaneyê dibêje:

– Bi buhayê pêncî qurişî xwarin bidin min. Vê neqlê firaqek du piç goşt tê de datinîn ber zilam. Zilam hêrs dibe û dibêje:

– We duh bihayê pêncî qurişî firaqek tijî goşt kiribû, iro hûn du piç goşt tînin ji min re? Xwediyê aşxaneyê dibêje:

– Her roj ker namirin

## Ez vê bişkînim..

Kurê pîrê dibêje diya xwe: "Here keça mîr ji min re bixwaze." Pîrê diçe koşka mîr ser kursiyê xwazgîniyê rûdine. Civata mîr berhev dibe, pîrê berê xwe dide mîr û dibêje:

– Ez keça te ji kurê xwe re dixwazim.

Mîr fetke hal û pergala pîrê û destenê dixe tûrikê xwe û sê lib gûzên qesil stûrê wekî bastik hişk derdixe û dide pîrê. Dibêje:

– Sertê min ew e ku tu van gûzan bi devê xwe bişkîni.

Diran di devê pîrê de nîn in, pidîyê pîrê helane, dema devê xwe didê hev û din kepî û erzênda pîrê digihê hev.

Gûzekî dixe devê xwe, dibe û tîne. Pîrê gûz ji devê xwe derdixe dibêje:

– Mîrê min ez vê bişkînim dimîne dudu ne wisa?...!

## Sertênl Islamê

Mele ji feqî dipirse:

– Sertênl Islamê çend in?

Feqî dibêje:

– Şes in. Mele hêrs dibe

– Çawa şes in. Ka ji min re bijmîre?

Feqî dibêje:

– Sewm û selat, hec û zekat, kelimeyê şahadet, keleşkofek û pênc text fişek.

## Ne ewet

Ehmedê Berkeverî etar e. Ew û kurê wî Eli barê xwe wê bibin gundê Zirgûzê. Kumandarê Qereqola Zirgûzê hez ji zirgûziyan nake. Kumandar ji Ehmedê Berkeverî re dibêje:

– Hûn li Zirgûzê nasekinin, ne we ye? Ehmed Tirkî nizanê. Hema dibêje:

– Evet.. Riya xwe digirin derbas dîbin, diçin Zirgûzê. Eli dibêje bavê xwe:

– Yabo, te got kumandarî em nasekinin û tu disekînî. Niha wê bê danê me. Ehmed dibêje:

– Çawa em nasekinin. Deyn û bazarê me tev li vî gundiye. Eli:

– Kumandarî gote te "Hûn nasekinîn, ne we ye?" Te got: "Ewet".. Ehmedê Berkeverî hêrs bû û gote Eli:

– Çupilmê lê dayî. Here bibêje bavê min gotiye ne ewet.

## Mayînê di rê de

Xelîl li Almânyayê karker e. Hevalê wî Hesen tevî jina xwe di ber qereqola gund re diçe malê. Xelîl di erebeya xwe de li ber Hesen disekine û dibêje:

– Tu fihêt nakî, ma te medeniyet nedîtiye, jina te sê qevzan li paş te tê.. Û ereba xwe diajo. Pênc sal dikeve neqebê Xelîl careke dî hatiye gundê xwe. Xelîl Hesen û jina wî dibînê, lê çi dibînê. Jina Hesen deh qevzan li pêsiya Hesen dimeşe. Xelîl:

– Kura Heso helal bê ji te re. Min got medeniyet lê ne ev qas jî.. Hesen bi hêrs li Xelîl nêri û got:

– Medeniyeta çi kuro, ez jina xwe ji ber mayînan li pêsiye dimesinim.

## Ax yabo...

Mîr giro biye. Her roj xwîna zarokekî heft salî di laşê xwe dide, heta pê baş dibe. Lî dema serê zarokekî bê jêkirin, divê bavê wî destê wî, diya wî lingê wî bigire û bi hawar hawarê zarokî re mîr serê wî jê bike.

Dîsa wekî her roj zarokek anîne wê

serê wî jê bikin. Mîr kêt danî ser qirik zarokî û pilxanê kenê li zarokî da. Mî ecêp ma û ji zarokî pirsî:

– Çima tu dikenî?

Zarokî got:

– Ma çima ez nekinim, ez bibêjim ax yabo, bavê min destenê min girtine. Ez bibêjim ax yadê, diya min lingê min gitte. Bejim ax mîrê min, mîr kêt di des xwe de girtiye. Ez bibêjim ax Xwedê Xwedê ev bela bi serê min de anîye. Ta hawar û hêviyên min nemane. Ma çim ez bigirim.

## Leşkerên Burdurê

Ev pêkenok li dora Ege tê gotin:

Leşkerên Burdurê wê li Kurdistanê belav bikin. Mirovên leşkeran tev tê torpilan çedîkin, da ku zarokên wan neçin Kurdistanê. Yê bêtorpîl Temel reben e. Qumandarê Temel jê re dibêjê:

– Temel te ku der divê ez te rîkim wê derê?.. Temel dibêjê:


– Dera ala me lê bihejê, ew ku der jî be, ez herim wê derê.

Leşker têñ belavkirin. Temel didim Cizirê. Mehek derbas dibe, Temel nameyekê ji kumandarê xwe re bi rîdike. Di serê nama xwe de:

– Qumandar im, kîjan segbavî ala me daniye vê derê?

BERHEVKAR: DR. HÜSEYIN NANTU

## BIXELAT...



## Bersiva Xaçepirsa 51'an


Xaçepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de ci bersiv bigihîjin me, emê wan binixînin û bi riya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmara me ya 53'an pirtûka "ÖZLEMIN GÜL SURETİ" ye

### Jêrenot:

Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarı" di nava qutiyêni li bin xâçepirse de binivisin û tevî adresa xwe ji me re bisînin.

Pênc kesen ku xelata xaçepirsa hejmara 51'an, pirtûka FIRAT CEWERÎ "Kevoka Spi" qezenc kirine: Hebûn Okçu/ Amed, Berivan Tulin/ Tarsus, İsmet Korur/ Ruha, Ercan Doğan/ İskenderun, Cem Ulu/ Qers

## XAÇEPIRSA BIXELAT (53)



## PEYVA VEŞARI



## Guherîn pêwist bû

*Destpêk 8-9*

Hûn vê gavê jî fêkiyên wê ïnada xwe dixwin... Yekî digot, "cerekê min kaset Ciwan Haco danî serê, diya min xeyidi. 'Kaseteke bi kurdi tune tu deynê serê, ev çi ye?' got."

● Ew teba min, ew zehmetiyên min vala neçün, pistî ku min ev kaset çêkir, gelek rê li pêsiya min vebûn. Rast e, şerê min dihat kîrin, lê ji aliyê din ve, kesen ku gelek aliyê min kirine jî hebûn. Wekî kuramê min Goran Haco. Wî ez bi Rojen Barnas dame naskirin, wî bi xwe jî gelek stran ji min re nivisandine, weki "Diyalog", "Dostanî", "Generalekî tisonok"

Icar wî û gelekên wekî wî, gotin min: "Guherîn xwe nedî kesî, tu di riyek rast de yî, berdewam bike..." Digotin, "Tuyê gelek zehmetiyân bikisînî, lê berdewam bike." Ji min re ji, hingê hate diyarkirin ku êdî hew kesek dikare min bide sekinandin. Ezê berdewam bikim, heta dawiyê.

Kasetên we naşibine hev. Di navbera wan de cüdabûnên balkes hene û ji xeynî muzikê di dengê xwe de jî, hûn guherînan çêdikin, lê diyar e kai bi kaseta "Dûri" re, dengê we xeta xwe dit, ji niha û pê vê jî, wê di dengê we de guherîn çêbin an na?

● Guhartin wê her hebin, wê çêbin. Piştî çend heyvîn din tu li "Mirina Egidekî" guhîdarî bike, tê guherînen mezîn bibînî. Şîira Mehmed Uzun ku li ser şehîdbûna pênc gerîlayan nivisandiye. Berî çend salan Mehmed Uzun ev şîr da min, got ku tu dikaribî, bike stran. Wexta ku min şîr xwend, gelekî kîfa min jê re hat û ez jê tîrsiyam ku çêbikim. Ji ber ku şîr gelekî dirêj bû. Goran ji got, divê tu vê çêkî. Gelekan li ser şehîdîn me, li ser roniya çavîn me şîr nivisandine, ji sedî sed tîstîn xwe jî hene, lê ji min re ev ji tevan xwestîr hat. Lewma min di dilê xwe de jî got, lazim e ez vê çêkî.

Ez li dor du mehan di studyoyê de, bi muzikvanen herfî bi nav deng re (yê Norwecê) li serê xebitîm. Hê jî xelas nebûye, hê jî li ser kar dikim. Ev kaset di muzika min de guherîne gelekî mezîn e. Ev kaset bi temamî stranek e. Û ez jî naxwazim kaseten min bisibîne hev...

Lê ji ber ku xebata vê kasete zêde dirêj bû min dest bi xebata kaseteke dinê kir. Ev kaset

wê piştî heyveke dinê derkeve. Navê kasete "Bilûra min" e. Ji şîira Mîr Celadet hatîye çêkirin. Di kasete de neh stranen gelêri û yên modern hene. "Mirina Egidekî" ji wê havînê çap bibe.

Di vê kasete de, guherînen çawa hene?

● Bi rastî ev tiştekî nû ye, tiştekî enternasyonal e. Yek dikare vî navî lê bike Etano-caz... Tiştekî ku herî zehf alîkariya min dike, gotin e. Gotin gelek xweş e, her insanekî kurd wê jê fêm bike, lê muzik... Bi rastî ez jî nizanim, guherîneke mezîn heye...

Dema hûn muzika xwe çêdikin, hedefeke çawa datînî pêsiya xwe û hûn xebata xwe bi çi tarzî dîkin?

● Fikrek tê bîra min, pêşî ez tenê li ser vê fîkrê kar dikim, dûv re ez vê ji wan muzikvanan re lê didim. Ji sedî sed tesîra van jî li serê çêdîbe. Carinan dibêjin "Ev tiştekî nebaş e", carinan ji dibêjin "Ev gelek baş e, lazim e em tescîl bikin." Edî ez naxwazim qeraran tenê bi serê xwe bidim, ji ber ku niha grubek heye ku ez bi wan re kar dikim. Me "Mirina Egidekî" ji wan re tercûme kir. Dihatin dixwendin, me li serê münaqşe dikir û heta iro jî ew münaqşe dewam dike.

Yanê hûn xebateke kolektif dîkin...

● Belê xebateke kolektif... Nexasim di kaseta "Mirina Egidekî" de, ev xebata bi hev re diyar e. Her insanekî ku dihate stûdyoyê pêşî şîr dixwend hê lê dida. Carinan hinek dihatin, dixwendin û digotin, "Ez iro nikarim lê bidim, iro tiştek ji min dernayê, belkî sibê ez karibim tiştekî bikim..."

Tîştekî ku ez çêkim, dixwazim gelekî li serî bisekinim, naxwazim bikevîm stûdyoyê û di demeke kurt de xelas bikim. Her gaveke ku ez biavêjîm, divê di cihê xwe de be, an jî ez nakim...

Aborî li pêsiya we nabe asteng?

● Belê astengiyen aborî gelek in. Heta niha min ji bo tescîl ji hevalan alîkari girtiye, lê disa jî astengî xelas nebûne, tevî ku muzikvanan jî heta niha tu pere ji min nestandine. Lê ji ber ku stûdyoya ez lê kar dikim gelek buha ye, astengî hene. Û ez jî mecbûr im li stûdyoyen baş xebata xwe bikim. Ev kaseten min, yêne pêşî di stûdyoyen ne baş de hatine

amadekirin, ji ber vê jî gelek kêmasyî wan hene. Ev problem e, lê divê ez li ber xwe bîdim û ez didim...

Hûn ji xeynî sazê jî li enstrûmanan didin?

● Na, hinekî li gitârê dixim, lê ne zêde baş...

Hûn diçinê şevan jî, di van şevan de ci astengî derdikevin?

● Belê di şevan de astengî derdikevin. Wekî her insanekî kurd, ez jî dixwazim bêşdarî şevan bibim, lê bi rastî şev ne cihê muzikîne. Ji ber ku mikrofon xerabe ne, qelebalixa zarokan... Lê disa jî cihekî şevan i taybet heye. Ezê derkevîm şevan, lê di pêşerojê de ezê kêm bikim, ji ber ku, ew gruba bi min re derdikeve hew qebûl dike.

Di vê dawiyê de festîvalek çêbû, dema teklîf kirin min jî got ev festîvala gelê kurd e, emê herin. Ez û gruba xwe em li dor saet ye-kê gihane wir. Em ketin oda xwe û li wir man. Piştî du saetan hevâlek hat, min got: "Ji kerema xwe re ev muzikvanen bi min re lê didin tehibîne, dixwazin niha derkevin." Bersivek neda min. Min belkî ji deh kesan re got, kesî bersivek neda... Em neh saetan li wir man, pişt re hatin gotin, festival xelas bû, li stadyûmê kes nemaye.

Bi rastî ev tiştekî ne xweş bû. Ew muzikvanen xerîb ji devekerke dûr hatibûn, dixwazîn besdar bibin, lê mixabin ew derneexistin. Û nedixwestin heqîya muzikvanen jî bidin. Tiştekî balkes bû; dema ez bi hevâlekî re şîte-xilim, got: "Hûn derneketine ji ber wilo jî, em alîkariya we nakin." Wekî ku li ser xwes-teka xwe em derneketibin. Piştî du saetan ji nuka heqê riya me dane me. Ew muzikvanen bi min re hatibûn, gelekî aciz bûn, dilşikestî vegerîyan.. Ez hêvîdar im ku êdî tişten halo gênebin.

Bi rastî ev insan nexweş in, problemen wan yên şexsî hene, dixwazin di serê hinekîn dîr de derxin. An jî dixwazin yekî ji vê dozê dûr bikim. Ev doz ne milkê bavê hinekan e, yê her insanekî kurd i welatparêz e. Kesek nikare bibêje ev doz doza min e. Ji ber wilo jî, kesek nikare min dûrî vê doza me bixe, min dûrî vê şoreşa me bixe, wekî her insanekî kurd tiştekî ji min were, ezê bikim. Ez ji mîletê xwe, ji doza xwe dûr nakevîm.

Bila her kes jî vê zanibe, ew kesen ku li qafê çiyayê Kurdistanê ne, yê ku li Bagokê û li Cûdî ne, heta ez bimirim wê dilê min bi wan re be.

**WELAT**

Rojnameya Hefteyî  
(Haftalık Gazete)

Li ser navê  
Zerya Basın ve  
Yayınçılık  
San. Tic. Ltd. Şti.  
(adına)  
Xwedî (Sahibi)  
CELALETTİN  
YÖYLER

**NAVNIŞAN**  
Ayhan Işık Sk. No:23/3  
Beyoğlu / İSTANBUL  
**TEL-FAX**  
(0 212)  
251 90 13

**Gerînendeyê Weşanê**  
(Yayın Yönetmeni)  
SAMÎ TAN

**Berpîrsê Karên**  
Nîvîsaran  
(Yazî İşleri Müdürü)  
DÜZGÜN DENİZ

**Berpîrsê Sazîyê**  
(Müessese Müdürü)  
TAHIR ELDEMİR

**ÇAPXANE**  
Yeni Asya Matbaacılık  
A.S.

**BELAVKIRIN**  
BIRYAY Dağıtım

**NÜNERİTYIYEN ME**  
(Temsilciliklerimiz)  
Nimînendeyê Giştî  
yê Ewrûpâyê:  
M. Rojava

Suriye: Jan Dost  
Helîm Yûsîv  
Berlin:

Silêman Sido  
49-30-69002695

Hannover:  
Selim Biçük  
49-5721-81360

Munchen:  
Mahmut Gergerli  
49-871-670884

BrukSEL:  
Medenî Ferho  
32-02-466037  
Stockholm:  
Robin Kavşan  
46-8-7510564

Bonn:  
Ahmet Baraçkılıç  
49 228 66 62 49  
Celle:  
Wezir Saçık  
49 50 52 87 36

# Ji makdûren şer, zarok



**K**omîsyona Zarokan a ku girêdahî Komeleya Mafêni Mirovan a şaxê Amedê ye, xebatê xwe bi giranî li ser zarokên medxûrên şer didomîne. Heta vê gavê bi sedan dosya hatine nivisîn, lêkolin hatine kirin. Ji wan serîlêdanan çend mînakên balkêş.

**Ahvelat Turhallî:** Di sala 1980'yi de li Dara Hêne (Gênc) a Bingolê tê dînyayê. Ji ber ku bavê wê Mele Sidik Turhallî, li Amedê meletî dikir, malbata wan li Amedê bi cih bû. Wan debara xwe bi çandiniya erdê xwe yê li gund dikir. Ji ber vê yekê gelek caran diçûn gundê xwe Rezê û dihatin. Bavê wê M. Siddik Turhallî, di roja 29'ê tîrmeha 1992'yan de li ber Mizgefta Beratê ku li wir meletî dikir, ji hêla kesen tarî ve hate qetilkirin. Pişti ku bavê wê tê kuştin, rewşa malba-

ta wê ya aborî xerab dibe. Ji ber vê yekê malbatî disa berê xwe dide gund. Di roja 25.06.1993'yan de serê sibehê mala wan ji hêla hêzên dewletê ve tê şewitandin. Bêçare disa vedigerine Amedê.

Birayê wê yê mezin. Mihemed ji bo xebatê diçe Stenbolê. Ew jî li wê derê dikeve binçav, 30 rojan di bin çav de lê işkence tê kirin. Mihemed tê girtin. Ew hê jî girtî ye.

Di pûşpera 1994'an de vê carê birayê wê yê bi navê Ahmet dixin binçav, lê pişti hefteyekê tê berdan. Ahmet piş re mecbûr dimîne ku biçe derveyî welat. Di sala 1992'an de dayik, bira û xwişka wê Fatoş (4) têne binçavkirin. Di sala 1995'an de xwişka wê Amîne (16) tê binçavkirin.

Ahvelat, ji 8 zarokên malbatê, yê 6'an e. Rewşa wan vê gavê hem ji aliye aborî û hem jî ji aliye psikolojik ve gelekî xerab e. Ahvelat wiha dibêje: "Bavê min kuştin, gundê me şewitandin, êdi bila ev şer biqedê."

**Berrin Alökmen:** Di sala 1991'ê de li Stewra Mêrdînê tê dînyayê. Malbata wê li gundê Dêngizo ku li ser Stewrê bû jiyana xwe didomand. Di 1994'an de gundê wan tê şewitandin. Roja ku gundê wan tê şewitandin, bapîre wê Evdilqadir (60) bi panzerê ve tê girêdan û ji Dêngizo heta Suruçê bi erdê re tê kişandin. Piş re ji tê binçavkirin. Berrin wiha dibêje: "Ez wê rojê tu car ji bîr nakim."

Malbata wê ji 9 kesan pêk tê. Ji ber ku di malbatê de xorxên xebatê tune ne, bapîre wê yê 60 salî ji bo ku diebara wan bike, vê gavê şivaniyê dike. Du birayê wê hene jê mezin-

tir, Ferhat (8) û Ferat (10), li dibistana setayî dixwînin. Birayê wê Wedat jî 5 salî ye. Dayika wê Hemdiya gelek caran lêdan ji hêzên dewletê xwariye, heqaret lê hatiye kirin. Ji ber van lêxistinan diranî wê ên pêş şkestine.

**Hamit Kolakan:** Di sala 1986'an de li Bismila Amedê tê dînyayê. Malbata wî ji 12 kesî pêk tê. Mezinê malê Fexri 66 salî ye, çavên wî kêm e. Tu kar û xebat jê nayê. Feyziye 46 û bûka malê Fatma ji 35 salî ye. Zilamê Fatma Mehmet (23) li Girtîgeha Amedê girtiye. Ahmet (21) li Girtîgeha Burdurê cezayê sermedi (mûebet) lê hatiye birin. M. Emin li serê çiyê şehîd ketiye. Mahmut (15) di Girtîgeha Amedê de girtiye. Berê li Bismilê dijîyan, ji ber pest û kotekiyan vê gavê li Amedê dijin.

**Oktay Çaçan:** Birayê Oktay Çaçan, Muhamrem Çaçan roja 2'yê berfanbara 96'an seri le İHD'ya Amedê dide û wiha dibêje: "Ez û birayê xwe Oktay, roja 29'ê sermawezê em çûn daweta miroveme Yusuf Mercan. 30'ê sermawezê saet li derdora 17.20'an, dema me bi hev re govend digirt; ji 100 metroyî dûrî me kesek li set avahiyekê, kesen di dilanê de gulebaran kirin. Guleyek li serê Oktay ket. Me Oktay bir nexweşaneya dewletê, pişti otopsiyê ew sewqî Fakulteya Tipê ya Zanîngeha Dicleyê kirin. Lî Oktay li wê derê canê xwe da. Kesen ku em gulebaran kir Serkomiserê tîmîn taybet İbrahim Yılanlıoğlu ye. Me der heqê wî de doz vekir."

Di sala 1996'an de li gorî tesbîten İHD'ya Amedê, çend mînak der heqê ihlâlkiriua mafêni zarokan de:

**07.02.1996:** Li Hezixa Şîrnaxê G. Çantay (9) û Hikmet Alkan (17) di dema çêrandina pez de, bombeyekê dibînin, pê dileyizin, di destê wan de diteqe. Hikmet Alkan di cih de can dide, Çantay bi rewşekê birîndariya xedar radikin nexwes-

Şer li her derê tesîneke neyin li ser însanî dike, li reng, nijad, bigûkbûn û mezînbûnê nanîhêre. Her wiha kesen ku şer dimesinji nesîbê xwe ji qirejîya şer hilidin. Lî yê ku henî zêde di bin bandora şer de dimînin ji zarok in, ev ji rastiyekê jîyanê ye.

Divê ev ji neyê ji bir kirin ku dema gelên bindest qala mafêni xwe yên demokratik dîkin, zordest riya şer didin ber wan û ew ji mecbûr dimînin ji bo mafêni xwe şer bilin.

xaneyê.

**10.02.1996:** Li gundê Meymuniyê yê Batmanê, zarokek bi navê Ekrem Çelik bombeyeke êrifê dibîne, tîne dibistanê Ew û hevalên xwe pê dilîzin. Teqîn çedi be, Ekrem Çelik dimire, zarokên bi navê Isa Yıldız (11), Necip Çelik (11), Habî Demir (13) Süleyman Tunç (11), Ömer Tunç (9), Newzat Bağ (13), Adnan Bağ (7), Fuat Bağ (10) Mahmut Bağ (8) i Mahmut Yıldız (10) ji birîndar dibin.

**26.02.1996:** Li Pasûra Amedê, li dor hêla qada tatbîqata fermandariya leşkeri yê, zarokên ku bi "guleyên lavê" dileyizin, D.T (10), M.T (12) û İ.B (14) pişteqîna guleya lavê bi awayekî xedar birîndar dibin.

**23.05.1996:** Li Erçeka Wanê Ahmet Yıldız (15) û Kerem Yıldız (16) bombe yekê dibînin. Di destê wan de diteqe. Ke rem dimire û Ahmet ji birîndar dibe.

**26.05.1996:** Abdullah Sözcük, (16) Yusuf Sözcük li navenda Wanê pê bombeyê dikin, teqîn çedîbe; Abdullah can dide, Yusuf birîndar dibe.

**22.08.1996:** Li Çela Culemîrgê, tê pêñi hawanê ku ji hêla leşkeran ve tê avetin, di ser malekê de dikeve û diteqe; zarokên di malê de yên bi navêni Fatî (5), Salim (6) û Semra Seven (19) dimirin. Şehîban û Mehmet Sever ji birîndar dibin.

**01.12.1996:** Li gundê Nedara yê Rûsûr sercerdevan Bedri Bozkurt pê li mayînê dike, bi teqîna mayînê Bedri Bozkurt dimire. Cerdewanî ji malbata Bozkurt, pişti vê bûyerê li navenda Pasûra Çekîn otomatik derdorê gulebaran dikin. Di vê bûyerê de Çiçek Akkaş (8) dimirin. Şalihe Kevirbiyi

**10.12.1996:** Li gundê Durucaya Rûsûr, ji ber nexweşîyeke ku nav lê nayî kirin 8 zarokan jiyana xwe winda kirin.

SALİHE KEVIRBIYI



Ahvelat Turhallî



Berrin Alökmen



Hamit Kolakan



Oktay Çaçan